Rupel 1+++++++++++++++++:Layout 1 26.09.2010 16:39 Page 1



# Îro çav li vê hevdîtinê ye

**Hefteya borî hevdîtina KCD'ê û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji ber rewşa hewayê hate astengkirin. Heke astengiyek dernekeve dê îro hevdîtina Heveseroka KCD'ê Aysel Tugluk û Ocalan pêk bê. Her kes li hêviya vê hevdîtinê ye**

### TUGLUK DÊ ÎRO BIÇE ÎMRALIYÊ

Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk li ser biryara rêxistinên civakî yên li herêmê ku hefta borî ji bo biçe Îmraliyê rojên çarşem û înê serî li rayedaran da lê rastî astengiya "Muhalefeta hewayê" hatibû. Tugluk, dê îro dîsa biçe Gemlikê û hewl bide biçe Îmraliyê bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêk bîne.

### LI GORÎ METEROLOJIYÊ REWŞ ASAYÎ YE

Ligel Aysel Tugluk û parêzerên Ocalan, Dogan Erbaş dê 3 parêzer bi boneya bi Ocalan re hevdîtinê pêk bînin dê îro biçin navçeya Gemlîkê ya Bursayê û piştre biçin Îmraliyê. Li gorî agahiyên Midûriyeta Giştîya meteorolojî dan, rewşa hewayê asayî ye. Midûriyetê anî ziman ku îro di navbera Gemlîkê û Îmraliyê de hewa asayî ye... *RÛPEL - 5*



## Ji Weşanxaneya Medê pirtûkên Apê Mûsa

Weşanxaneya Medê hemû pirtûkên Apê Mûsa ji nû ve weşand û îmzeya xwe avêt bin xebateke giranbuha. Weşanxaneyê pirtûkên wekî; "Kimil, Birîna Reş, Nivîsên di rojnameya Ulke û Gundemê, Bîranînê min û Vakayîname" ji nû ve amade kirin û weşandin. Daxwazeke mezin ji bo pirtûkên Apê Mûsa hebûn û weşanxaneyê valahiya di vê alî de tijî kir... *RÛPEL - 11*

www.welat.com

# Rojeva Welat

27 Îlon 2010 Duşem Buha: 50 Kr Hejmar: 20 E-mail: awelat2002@yahoo.com



## Qirkirina 16'ê Îlonê aşkera bikin

Dewlet û hikûmeta AKP'ê li hemberî vê biryara PKK'ê ku di parastina pasîf de bimîne û pêvajoya bêçalakîtiyê dirêj kir dê bikevin nava hewldaneke çawa em ê bibînin. Her çiqas wisa be jî li ser hin bûyerên qewimîne û xisûsên dixwazin derxin pêş divê mirov li ser bisekine. Beriya her tiştî divê qirkirina li gundê Peyanisê ya Colemêrgê ku di 16'ê îlona 2010'an de pêk hat divê neyê jibîrkirin û lêkolîna vê bûyerê bê kirin ku berpirsyarên rasteqîn derkevin holê... *Nivîsa Cemîl BAYIK R.2*

## Qirkirinê li dû xwe gelek êş hiştin

Di 16'ê Îlonê de li gundê Peyanisê yê Colemêrgê teqîn pêk hatibû û 9 welatiyan jiyana xwe ji dest dabû. Piştî bûyerê jiyanên bi êş û elem li dû kuştiyan man. Di teqînê de welatiyê bi navê Eşref Gorê 33 salî jiyana xwe ji dest dabû û li pey wî hevsera bî û 3 zarokên sêwî man. Gor, piştî zewicî, bi salan di înşeatan de xebitî û bi kedek mezin li taxa Gazî ya Colemêrgê xaniyek ava kir. Piştî Gor xanî ava kir û tenê 3 rojan di xanî de bi cih bû, bûyer pêk hat û jiyana xwe ji dest da... *RÛPEL - 3*



# Bi saxî xistin gorê

Di tu olan de kes bi saxî naxin gorê. Lê dema mijar kurd bin dewleta tirk bo xwe her tiştî rewa dibîne. Ligel şahidên bûyeran hene jî di dema hikûmeta AKP'ê de dozgerên dewletê bo lêpirsîna kirinên der barê kurdan de nakevin nav hewldanan



### YEK JI GERÎLAYAN BIRÎNDAR BÛ

Qirêjiya dewleta tirk a di şerê 30 salan de yek bi yek derdikeve holê. Di operasyonên artêşê de li cihên cuda gelek endamên PKK'ê jiyana xwe ji dest dan û gelek jê bi tomerî hatin definkirin. Ji bajarên ku herî zêde gorên tomerî derdikevin yek jê Bedlîs e. Di operasyona sala 1998'an de li Zozana Duavê ya Bedlîsê pêk hat de yek jê bi birîndarî 17 PKK'î bi komî di sergoyê Bedlîsê de hatine definkirin.

### 17 PKK'Î LI SERGOYÊ BEDLÎSÊ VEŞARTIN

Şahidê bûyerê Îbrahîm Aysal ê 70 salî, diyar kir ku nîvro cenaze anîbûn û li ber Qereqola Cendirmeyan a Mahallebaşiyê teşhîr kiribûn. Aysal, got yek ji wan birîndar bû em li ber şaredar geriyan ku yê birîndar derman bikin, lê şaredar ji wan re wiha gotiye 'mirin û saxiya kafiran nehêjayî xelaskirinê ye'. Aysal, diyar kir ku tevî yê birîndar her 17 PKK'î li cihê sergoyê Bedlîsê veşartin... *RÛPEL - 4*

# Li kolanên Amedê îşkenceya polîsan

Digotin 'sifir tolerans' lê li Kurdistanê îşkence li kolan û ber kamerayan bi awayekî aşkera tê kirin. Ji ber nasnameya polîsan pirsî rastî îşkenceyê hatin



3 birayên hev ku 2 jê karmendên dewletê ne, dema diçûn malê li Dîclekentê ji aliyê polîsan hatin sekinandin. Lê ji ber ku polîsên sivîl nas nekirin, nasnameya polîsan xwestin. Li ser vê yekê polîsan heqaret û dijûn li wan kirin. Piştre ekîbên polîsên sivîl hatin cihê bûyerê û îşkenceya polîsan dest pê kir. Îşkenceya polîsan ji aliyê kamerayên MOBESE ve hatin qeydkirin. Ji sê birayan yek jê ji ber lêdana polîsan a xedar 45 rojan rapor wergirt... *RÛPEL - 3*

## Beşîr Atalay li Hewlêrê ye

Wezîrê Karên Hundir ê Tirkiyeyê Beşîr Atalay ji bo hevdîtina bi Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî re pêk bîne çû Hewlêrê. Tê payîn ku di hevdîtinê de tedbîrên ku ji bo PKK yên başûrê Kurdistanê bigirin bê axaftin. Hate daxuyandin ku Musteşarê MÎT'ê Hîkmet Fîdan jî biçe başûrê Kurdistanê û ji bo vê yekê jiwanî hatine eyarkirin. Hate destnîşankirin hevdîtinên Fîdan jî der barê PKK'ê de bin... *RÛPEL - 6*

## Êrîşeke li ser bedena jinê ye

Jinan li dijî sahneyên tecawizê yên fîlmê 'Sûcê Fatmagul çi ye' nerazîbûn nîşan da û gotin ku êrîşeke cidî ya li ser bedena jinê ye, ne cureyeke zayendiye. Her wiha jinan daxwaz kir ku divê fîrmayê ji jinan lêborîne *bixwaze... R.7*

## Arîf Dogan kirinên qirêj vegotin

Avakarê JÎTEM'ê yê ku ji doza Ergenekonê hatiye girtin û bi hinceta ku nexweş e serbest hatiye berdan ji rojnameyekê re axivî. Arîf Dogan der barê kirinên xwe yên qirêj der barê gelê kurd û rastiya JÎTEM'ê de agahî dan... *R.4*

www.arsivakurdi.org

CEMÎL BAYIK

## Kesên Qirkirina 16'ê Îlonê pêk anîn divê bên aşkerakirin?

PKK biryara xwe ya "pêvajoya bêçalakîtiyê" û "parastina pasîf" ku ji 13'ê tebaxê dest pê kiribû û di 20'ê îlonê de bi dawî bûbûya, ji raya giştî re aşkera kir ku heta daxuyaniyeke nû bê dayîn dirêj kiriye. Vê daxuyaniya PKK'ê ji aliyê raya giştî û derdorên hestyar ve bi erênî hate pêşwazîkirin. Lê ji aliyê dewlet û AKP'ê ve, vê biryara dirêjkirinê dê çawa bigirin dest weke mijara nîqaşê derdikeve pêş.

Dewlet û hikûmeta AKP'ê li hemberî vê biryara PKK'ê ku di parastina pasîf de bimîne û pêvajoya bêçalakîtiyê dirêj kir dê bikevin nava hewldaneke çawa em ê bibînin. Her çiqas wisa be jî li ser hin bûyerên qewimîne û xisûsên dixwazin derxin pêş divê mirov li ser bisekine.

Beriya her tiştî divê qirkirina li gundê Peyanisê ya Colemêrgê ku di 16'ê îlona 2010'an de pêk hat divê neyê jibîrkirin û lêkolîna vê bûyerê bê kirin ku berpirsyarên rasteqîn derkevin holê. Ev wekî mijareke girîng derdikeve pêş me. Çimkî di 16'ê îlonê de ne tenê qirkirinek pêk hatiye, bi vê qirkirinê senaryoyek nû û planeke qirêj xwestin bixin dewreyê. Lê nerazîbûna gelê kurd a bi rêxistinkirî, kontrolkirî û hişmendî daxwaza kesên ku vê dezgeha lîstika qirêj dixwestin bilîzin di qirika wan de hişt. Ev yek hiştiye ku hêj zêdetir bifikirin û mecbûr hiştiye ku li gorî vê yekê gavan biavêjin. Ji van tiştên têne destnîşankirin divê encameke ku dev ji vê lîstika qirêj ku plan kirine berdane neyê derxistin. Li vê derê li hemberî sekna gelê kurd gav paşde avêtine. Ev rastî divê rast bê dîtin.

Vê paşde gavavêtina ku yên qirkirina 16'ê Îlonê pêkanîne, nakokî û pirsgirêkên di nava xwe de dijîn hêj kûrtir kiriye. Hêj raya giştî bandorên vê qirkirinê ji ser xwe neavêtiye, ketina hin rojevên nû ya dewreyê jî nîşaneya vê yekê ye. Lê mijarên hatine rojevê jî encama kûrkirina nakokiyên ku qirkirina 16'ê Îlonê bûye sedem e.

Bala xwe bidinê di nava germahiya nîqaşên qirkirinê de suîqesta li hemberî Turgut Ozal û mirina yek ji fermendarên giştî yê cendermeyan ê wê demê Eşref Bitlis ketiye dewreyê. Kurê Turgut Ozal, Ahmet Ozal aşkera kir ku li pişt sûîqesta li hemberî bavê wî pêk hatiye Sabrî Yîrmîbeşoglu heye. Sabrî Yîrmîbeşoglu jî pisporekî kontrgerîla û Serokatiya Daîreya Şerê Taybet kiriye. Kurê Eşref Bitlis, Tarik Bitlis jî daxuyand ku bavê wî "Ne encama qezayekê, hatiye kuştin."

Nêrînên ku der barê suîqesta li hemberî Turgut Ozal û mirina Eşref Bitlis têne rojevê û nîqaşkirina kontrgerîla û Serokatiya Daîreya Hereketa Taybet ev yek tê wateya ku ev tişt dikevin rojeva raya giştî. Ev yek tê wateya ku ji çarçoveya dozên Ergenekonê ku li Sîlîvreyê tê dîtin wêdetir e. Di pêkhatina vê yekê de kes nikare înkar bike ku kesên qirkirina Peyanisê ya Colemêrgê ku di 16'ê îlona 2010'an de pêkanîn ji ber ku negihiştin armanca xwe ne qewimiye. Qirkirina di 16'ê Îlonê de ya ne serkeftî, bû sedem ku cînayetên ku berê pêk hatine kirin û bi tu awayî bi ser wan de neçûne xist rojevê. Hem jî bûye sedem ku şertên wan rojan têkiliyê bi yên îro re daynin. Ji vê yekê tê fêmkirin ku di rojên pêş de gelek cînayetên ku derneketine holê û bi ser wan de neçûne bibin mijara nîqaşê û ew ê bikeve rojeva raya giştî.

Helbet ev tiştên diqewimin ne serkeftina hikûmeta AKP'ê ye. Berovajî vê li hemberî AKP'ê û astengiyên wê, ev encama têkoşîna berxwedana gelê kurd a li hemberî şerê taybet-qirêj e.

Sûîqesta li hemberî Turgut Ozal û mirina Eşref Bitlis operasyoneke kontrgerîla ye. Dema ev bûyer qewimîn, nirxandinên Rêber Apo jî balê dikişîne ser vê rastiyê. Nirxandinên ku Rêber Apo wê demê kirine bi awayekî belge bûye mijara pirtûk û hevpeyvînan. Di 16'ê îlonê de qirkirina li Colemêrgê jî di heman demê de operasyoneke kontrgerîla ye. Ev yek jî Rêber Apo di notên hevdîtinê de deşîfre kir û nêrînên xwe bi raya giştî re parve kir.

Qirkirina 16'ê Îlonê piştî boykota 12'ê îlonê bi hedef nîşandana R.T. Erdogan pêk hatiye. Ji ber vê yekê hikûmeta AKP'ê, R.T. Erdogan suîqesta li hemberî Turgut Ozal û mirina Eşref Bitlis ku kete rojeva raya giştî hewl dide ji xwe re bike mal. Ev yek jî durûtiyê îfade dike. Di vê hêlê de hewldanên ketine nav dê xwexapandinek be û bi her awayî derkeve holê. Çimkî qirkirina 16'ê Îlone li ber serê wan û di bin berpirsyariya wan de pêk hatiye, ji ber vê yekê ne mumkûn e ku kes ji R.T. Erdogan bawer bike.

Dema Eşref Bitlis mir, Serfermandarê Giştî yê wê demê Dogan Gureş û Fermandarê Hêzên Bejayî Muhittin Fusunoglu bêyî ku lêkolîn bikin di germahiya bûyerê de wiha gotin: "Di encama cemedîbûna perwaneya balafirê de bûyer qewimiye." Bêyî ku dem di ser re derbas bibe di encama lêkolînan de derket holê ku rastî ne wisa ye. R.T. Erdogan, Abdullah Gul û Serfermandarê Giştî yê Tirk hêj di ser qirkirina 16'ê îlonê de saetek derbas nebûbû daxuyanî dan û wiha gotin: "PKK'ê ev yek kiriye, dane jî vê yekê nîşan didin." Weke ku piştî mirina Eşref Bitlis çawa bi lezgînî hin tişt gotin, bi vî rengî daxuyaniyên lezgînî dan. Lê li qederê binêrin dîsa weke bûyera Eşref Bitlis ji destpêkê ve derewa wan derket. Çimkî delîlên li dû qirkirina 16'ê Îlona mane Tûgaya Komando ya Çiya ya Colemêrgê nîşan dide.

Li Tirkiyeyê rojeva bi lez diguhere xwe ji qirkirin û cînayetên kontrgerîla xilas nake. Ev yek jî ne mumkûn e bi awayekî din bibe. Di bin xirbeyên şerê taybet ê hilweşiyayî de, tiştekî cudatir ji vê yekê dernakeve.

Daxuyaniya PKK'ê ya piştî 20'ê îlonê ku di rewşa parastina pasîf de bimîne û biryara bêçalakîtiyê dê berdewam bike, ji bo paqijkirina van xirbeyan û sûcên şerê taybet-qirêj bêne mahkûmkirin, ji tiştê dihat hêvîkirin zêdetir derfet hatine afirandin. Hikûmeta AKP'ê ku li ku dera vê yekê ye, bersiva bide PKK'ê û kesên qirkirina 16'ê Îlonê pêkanîne bi derxistina pêşberî raya giştî mumkûn e. Gelo AKP dê vê yekê bike? Em ê vê jî bibînin.

# Hefteya rûmetê û boykota dibistanan

### Divê ev boykota TZPKurdî ya bi rûmet li ser bingeheke fireh li her qadên jiyanê bê avakirin û têgihîştin, da ku bigihîje armanca xwe

FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ



Gelo ji zimanê dayikê şîrîntir û bi rûmetir çi heye? Bi wî zimanî jiyîn, bi wî zimanî fêrbûn mirovbûn û xwe jiyan e. Li wî xwedî derneketin, ji wî revîn, hê ji sînorê ajaltiyê jî wêdetir e. Lema jî, li wî xwedî derketin serbilindî û serfiraziya herî payeberz, li ser vê pinda gerdûnê rastî û heyîya xwe idia kirine.

Ew dijminê bi salan e, zimanê me li me qedexekirî, fermana; têkbirineke spî, talaneke ziman ya qetranî, têkbirina mîjiyeke li ser çandeke dîrokî pêkhatî, têkbirina tirîjeke ji rengên bûka baranê ya zimanê mirovahiyê, daye. Wî dijminê ku bi dehan gel bi qedexekirinan têkbiriye, bi vê ferman ne mirovbûnê, di nava heriyeke ji ajaliyê wêdetir de rawestana xwe nîşan daye.

Li hemberî dijminekî wiha, li nik xiniziyeke wiha, li beramberê tunekirineke wiha diviyabû bi dehan salan berê bi helwesteke mirinê bihata rawestandin. Lê eger çi dibin, bila bibin, ev pêk nehat. Ev rûmeta ma li ser milê TZP ê. TZPê bi serfirazî boykota dibistanên kolonyalîst yên cigehên mêjî şûştinê da destpêkirin, lome ez dibêjim hezar car spas ji TZPê re.

Divê her kurd, her kesên xwe kurd dibînin, heta her kesê ku rûmeta mirovbûnê lê heye, bi fiîlî di vê boykotê de cihê xwe bigire. Ji vê boykotê pê ve jî, mala xwe vegerîne maleke kurdî û dibistaneke kurdî. Di her qada jiyanê de bi rikî zimanê dayikê bikarbîne.

Gava dê û bav kurdî nekin zimanê malê, zarok di malên xwe de hînî zimanê dayikê nebin, bi wî zimanî wate nedin cihanê û cihanê tênegihîjin, kesayetiya zarokan jî nakemile, xwebaweri di wan zarokan de peyda nabe. Kêliya navê kurdayetiyê bihîstin, ji xwe şerm dikin. Ev jî hem di dibistanan de û hem jî di jiyana rojane de bandoreke nerênî li kesayetiya wan dike. Divê dê û bav vê rastiyê baş bizanin: Kesê ku zimanê dê û bavê xwe bi zarokên xwe nedin fêrkirin, tê wê wateyê ku ew ji dê û bavê xwe şerm dike. Ew ne zimanê dê û bavê xwe, ew zimanê biyaniyan, zimanê dijmin layîqê zarokê xwe dibîne. Ev jî rasterast formeke ji xwe, ji dê û bavê xwe şermkirinê ye. Formeke îxanetê ye. Kurdên li welêt, yên ku xwe nas dikin, sîngê xwe ji hemû ceza û talûkeyan re vekirine dane ber lûleyên çekên dijmin û zarokên xwe naşînin dibistanan.

Lê li vir Ewropayê çi dibe? Me em mecbûr in ku li vir zarokên xwe bişînin dersên tirkî.

Tenê li eyaleta Nordrhein - Westfalen (Almanya) e, ji hefsed mamosteyên tirk yên dijminahiya kurdan dikin, zêdetir mamoste dersa tirkî û nijadperestî didin zarokên kurdan. Hîn di ser de jî, ew dê û bavana bi riza dilê xwe zarokên xwe dişînin dersên tirkî. Divê pêşî li vê xwekujiyê, vê şermê, vê eybê bê girtin.

Divê bi taybetî kurdên li Almanyayê li ser vê biryara TZP, ji bingeh ve dersên zimanê tirkî boykot bikin û zarokên xwe neşînin dersên zimanê tirkî. Bi dîtina min di vê rewşê de kurdên li Ewropayê zarokên xwe dişînin dersên zimanê tirkî, ne tenê ji dê û bavê xwe re îxanet dikin, ew ji mirovbûna xwe re jî îxanet dikin.

Divê hemû komalgeh, sazî û kesayetiyên kurd yên li Ewropayê bi her awayî bixebitin ku bi kêmasî li Ewropê pêşî li bişaftina kurdan ji bo tirkî bigirin. Ji bo pêkhatina vê jî divê di hemû saziyan de zimanê tirkî were rakirin (Min qedexekirin negot, qedexe tiştekî din e), her kes hewl bide xwe ku kurdî bibe zimanê me yê jiyanê û siyasî.

Hemû gelên cihanê li gorî deman serî li çalakiya boykotan dane. Li pey jî li ser rika xwe sekinîne, ta ku gihiştine armanca xwe. Wek mînak; boykota herî yekemîn li Îrlandayê dest pê kir. Îrlandiyan Saziya emlakê ya ingîlîzan boykot kirin, ne kesekî xanî û eraziyên wan kirê kir, ne jî kirîn, ta ku ew ji wir kişiyan.

Ji wê divê em vê boykota TZPê derbasî her qada jiyanê bikin. Gava yekemîn jî, divê em TV yên tirkan boykot bikin û wan pencereyên jehrê ji malên xwe derxin. Hetanê ku em wan televizyonên serîşûştinê ji malên xwe dernexin, em ê tu car nekanin, zimanê tirkî jî ji mala xwe û ji mêjiyê xwe têkin der. Ez diçim malên kê, her çendî qaşo welatparêz in jî, dibînim ku di malên wan de bê navber televizyonên tirkî vekirîne. Gava mirov bibêje; ROJ TV veke, yan jî kanaleke kurdî veke, rûyê xwe wisa tirş dikin ku, çawa ku ji dê û bavên wan re hatibe çêrkirin. De hûn bêjin: Wê çawa kurdî bikane têkeve wan malan?

Ji wê banga min a li hemû kurdan ev e: Werin, em ne tenê zimanê tirkî, berê hertiştî TV yên tirkî boykot bikin. Wan ji malên xwe der kin! Hetanê TV'iyên tirkî ji malên me dernekevin, gotinên me di valahiyê de dimînin û em xwe û der û dorên xwe dixapînin.

Divê ev boykota TZPê ya bi rûmet li ser bingeheke fireh were rûniştin û têgihîştin, da ku bikane bigihîje armanca xwe. Bi hêviya di her warî de serkeftina boykota dibistan û zimanê tirkî, ez vê çalakiya TZPa kurdî ji dil û giyanê ve silav dikim.

## XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Baneşana kêfxweşiyê... Rengek... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê **2.** Fen û fût, hîle... Cephe, bere **3.** Temen... Rengek **4.** Rengek **5.** Bi soranî 'av'... Baneşana bêhntengiyê **6.** Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Notayek **7.** Paytexta Norwecê... Xwarinên ji şîr **8.** Notayek... Nexweşiyek... Agir **9.** Kesê ku bi nexweşiya tayê ketiye... Kurtebêja Antîmonê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Beşeke malê, jûr... Di heyna berê ya yewnanan de devera ku gelê Sîteyê ji bo ku li ser siyaset, rêveberî û bazirganiyê mijûl bibin, lê diciviyan**2.** Kurtebêja Ksenonê... Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Hêjmarek **3.** Şexs... Eşîr, qebîle, hoz **4.** Kanaleke televîzyonê ya muzîkê ya kurdî... Kurtebêja otomobîlê **5.** Dirav... Tîpên navîn ên "raye"yê **6.** Rojek... Paytexta Îtalyayê **7.** Îşaret, şop... Bi rûsî erê **8.** Baneşaneke gazîkirinê... Gerestêrkek **9.** Kesê ku deng naçê, kesê ku guhê wî nabihîze... Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | K | I | L | ■ | K | A | L | ■ | K |
| 2 | Ê | L | ■ | Z | A | Y | Î | Ç | E |
| 3 | M | A | K | ■ | W | ■ | S | O | R |
| 4 | A | M | Î | R | A | L | ■ | R | ■ |
| 5 | R | ■ | N | O | ■ | I | R | S | Î |
| 6 | ■ | Z | ■ | J | Ê | ■ | A | ■ | N |
| 7 | D | O | T | ■ | D | A | ■ | S | S |
| 8 | Î | N | ■ | Z | Î | R | Ç | ■ | A |
| 9 | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] | [illegible] |



www.arsivakurdi.org

# Eşref bi xaniyê xwe şad nebû!

Eşref Gor karkeriya înşeatan kir, deyn kir û ji bo ku zarokên wî di kiriyan de perîşan nebin avahiyek ava kir. 3 roj bû ku di avahiyê xwe de cih bûbûn. Bo taziya hevalekî xwe çû Peyanisê û di vegerê de hate qetilkirin




**COLEMÊRG / DÎHA** - Qetlîama Peyanisê êş û birînên kûr li pey xwe hiştin. Piştî bûyerê li pey kuştina Eşref Gor, hevserek bî û 3 zarokên sêwî man. Hevsera Eşref Gor, Basra Gor, diyar kir ku hevserê wê di înşeatan de dixebitî û êdî barê wê gelek giran bû.

Di 16'ê Îlonê de li gundê Peyanisê yê Colemêrgê teqîn pêk hatibû û 9 welatiyan jiyana xwe ji dest dabû. Piştî bûyerê jiyanên bi êş û elem li dû kuştiyan man. Di teqînê de welatiyê bi navê Eşref Gorê 33 salî jiyana xwe ji dest dabû û li pey wî hevsera bî û 3 zarokên sêwî man. Gor, piştî zewicî, bi salan di înşeatan de xebitî û bi kedek mezin li taxa Gazî ya Colemêrgê xaniyek ava kir. Piştî Gor xanî ava kir û tenê 3 rojan di xanî de bi cih bû, bûyer pêk hat û jiyana xwe ji dest da. Piştî bûyerê hevsra Gor Basra Gor, li aliyekî êşa hevserê xwe dikşîne, li aliyê din dest bi têkoşînek dijwar a li hemberî jiyanê kir. Hevsera Gor Basra Gor, anî ziman ku rewşa wan a aborî nebaşe û ji ber xanî nû ava kirine gelek deynê wan heye.

**Dinya bi serê min de hilweşiya**

Basra Gor, ligel zarokên xwe Şiyar (9), Rûbar (5) û Esmanur (2) sersaxiyê qebûl dikin û hewl didin ku şoqa bûyerê ji ser xwe bavêjin. Basra Gor ku hêj di bin bandora bûyerê de ye wiha axivî: "10 sal in ez zewicî me. 3 zarokên min hene û ji ber me nû xanî ava kir gelek deynê me hene. Ji niha û şûnde ez nizanim ez ê çi bikim. Hevserê min Eşref ji bo taziya hevalekî xwe çûbû gund. Rojek berê saet di 4'an de çûbû û serê sibê vedigeriya malê. Lê hêj negihişt malê teqîn pêk hat û jiyana xwe ji dest da. Di serî de gotin qeza pêk hatiye. Piştî min bûyer bihîst tirs ket dilê min. Ji ber ku min zanîbû dê hevserê min vegere. Li ser vê yekê ez jî çûm ber deriyê nexweşxaneyê. Hin kesan ji min re gotin 'hevserê te birîndar e'. Hin kesan got 'birine Wanê'. Hin kesan got 'destê wî jê bûye'. Her keseki û tiştek gotin. Herî dawî gotin 'jiyana xwe ji dest daye'. Wê demê dinya bi serê min de hilweşiya. Tu guneh û sûcê Eşref tune bû. Çi sûc û guhenê me hebû ev yek bi serê me de anîn."




**Zarok hê jî serwext nebûne**

Gor, destnîşan kir ku wan hêj nû înşata xaniyê xwe temam kiribûn û hêj nû 3 rojan li xaniyê xwe yê nû bi cih bibûn. Gor, da zanîn ku hevserê wê ji bo ji zarokên xwe re avahiyekê saz bike bi salan di înşeatan de xebitî û tu xêr ji xaniyê xwe nedît.

Gor, anî ziman ku hevserê wê ji bo vî xanî gelek pere deyn kir û bêyî ku deynê xwe bide jiyana xwe ji dest da. Gor, gazinên xwe anîn ziman û wiha got: "Ez dê êdî çawa vî deynî bidim? Ez dê çawa van zarokan xwedî bikim û ez dê çawa bikim? Ez êdî ketime heyrê. Piştî mirina Eşref jiyana me dê tu carî nebe wekî berê."

## Ji bo girtiyên nexweş dest bi grevê dikin

**AMED** - Diyar TUHAD-DER, bi armanca balkişandina ser rewşa girtiyên nexweş û binpêkirinên mafan ên her diçin zêde dibin, dê sibê li Amedê dest bi greva birçîbûnê ya ji bo 6 rojan a dorveger bikin.

Rêxistinên civakî yên sivîl û xizmên girtiyan li hemberî bêdengiya rayedarên dewletê ya li hemberî rewşên girtî û hikûmxwarên nexweş û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan, dê dest bi çalakiyek nû bikin. Diyar TUHAD-DER, bi armanca balkişandina ser binpêkirinên mafan ên li girtîgehan û rewşa girtî û hikûmxwarên nexweş sibê li Amedê dest bi greva birçîbûnê ya 6 rojan a dorveger dikin. Xizmên girtiyan îro saet di 11.00'an de li ber Postexaneya Baglarê bên cem hev û nameyên daxwazên wan tê de ne jî dê jî Wezareta Dadê û Meclisê re bişînin. Malbat ji wir jî dê heta Parka Koşuyoluyê bimeşin û li konê hatiye amadekirin ji bo 6 rojan dest bi greva birçîbûnê ya dorveger bikin.

Piştî greva birçîbûnê malbat bi daxuyaniya çapameniyê ya bidin jî dê çalakiya xwe bi dawî bikin.



## Tu yî ji polîsan nasnameyê dipirsî

**AMED** - 3 birayên hev ku 2 jê karmendên dewletê ne, li Dîcle Kentê rastî îşkenceya polîsên sivîl hatin. Îşkenceya polîsan ji aliyê kamerayên MOBESE'yê ve hatin qeydkirin. Ji 3 birayan birayekî ji ber lêdana zêde 45 rojan rapor girt.

C.S. karmedê Gumrukê yê Deriyê Oncupinarê, E.S. Alîkarê Midûrê Dibistana Seratayî ya gundê Kaya ya Egîlê û P.S. ku li nexweşxaneyeke taybet teknîsiyenê diyalîzê ye, dema saet di 02.00'an ên 20'ê îlonê de li semta Dîclekentê ya Peyasê diçûn mala xwe, li Duryana Akyil ji aliyê 2 polîsên sivîl ve hatin rawestandin. Polîsan nasname ji wan xwest û wan jî li ser vê yekê nasname jî polîsan xwestin. Mexdûrê bûyerê diyar kirin ku di serî de polîsan nasname ji wan xwestiye û ji ber ku wan polîs nas nekirine wan jî nasname ji polîsan xwestine. Mexdûran anî ziman ku ji ber wan nasnameya polîsan nedîtiye îtiraz kirine û li ser vê yekê polîsan çekên xwe derxistine û ji wan xwestine ku destê xwe rakin. 3 birayên nasnameya polîsan nedîtin gotin ku "Heta em nasnameya we nebînin em destûrê nadin ku hûn lêgerîn li ser me bikin" li ser vê yekê polîsan heqaret û dijûn li wan kirin.

**'Gaz dan û darp kirin'**

Ekîbên polîsan ên fermî û sivîl hatin cihê bûyerê û 3 bira li kolanê darpkirin û birin Qereqola Polîsan a Huzurevlerî. Dema li qereqolê îfade didan polîsê ku tev bi bûyera lêdanê bûbû ket hundir. Ji ber vê yekê mexdûran îfade nedan û ev yek ji aliyê parêzeran ve di girdekê de hate girtin. Piştre 3 bira derxistin dozgeriyê û der barê polîsên ew darpkirin gilî kirin. C.S., di îfadeya xwe ya dozgeriyê de wiha got: "Polîsan ji me re çerê 'bijmolte, hûn kî ne ku ez dê nasnameyê nîşanî we bidim' kir. Min nasnameya xwe ya karmendiyê nîşanî wan da. Ji min re gotin 'ez jî karmendê îstîxbaratê yê kaçax im. Me tu tişt nekir' Li ser vê yekê polîsan gote min 'hişbe lo' Bera xwe nedan nasnameya min. Piştre jî hinek ekîbên din hatin cihê bûyerê. Nêzî 3-4 ekîp hatin cihê bûyerê û piştî qelebalix bûn em vekişandin. Ekîbên hatin gaz avêtin nav çavên me û bi pêhan li me xistin. Heqaret li me kirin û em darpkirin."

**'45 roj nikare kar bike'**

Piştî îfadeyên dozgeriyê 3 bira çûn Nexweşxaneya Dewletê ya Amedê û nexweşxaneyekî taybet û C.S., rapora 45 rojan nikare kar bike girt. 3 birayên rastî êrişa polîsan hatin serî li TÎHV'ê jî dan teşhisa derûniya wan xiranbiye danîn ser.

Polîsên şikdar ên îfade dan jî îfadeyên wan heta şaşiyan jî wekî hevbûn. Polîsên şikdar Î.G. û M.E. îfadeyên wan şaşî jî wekî hevbûn. Polîsan di îfadeyên xwe de diyar kirin ku 3 birayan dûjîn wan dane û wan jî ji ber wê yekê gaz avêtiye ser çavên wan.

**Dimenên mobeseyê**

Kamerayên mobeseyê yên li Bulvara Dîcle Kentê hatine bicîhkirin, îfadeyên polîsên gumanbar derew derdixin. Di dîmenan de, piştî bûyer dest pê dikin tê dîtin ku 15 deqîqe şûn de wesayîta polîsan tê cihê bûyerê û polîs dest bi lêdanê dikin. Di dîmenan de polîs li C.S. didin û piştî wî dixin erdê û bi pêhna lê didin.

**'Îşkencekeyek aşkera ye'**

Parêzerê birayên rastî lêdanê hatin Diyar Rukneddîn Çetedîr, diyar kir ku bûyer "îşkenceyek vekiriye" û da zanîn ku li herêmê bûyerên wiha bênavber tên jiyîn û dê şopdarên bûyerê bin. Çetedîr, anî ziman ku pêkanînên polîsan nêzîkatiya li hemberî gelê li herêmê ye û ji Midûriyeta Polîsan a Amedê xwest heta pêvajoya edlî biencam bibe, polîsên tên îdiakirin beşdarî vê pêkanînê bûne ji peywirê bên girtin. Çetedîr, bi bîr xist ku mafê dema polîs nasnameya bipirsin ê pirskirina nasnameya polîsan jî di zagonan da hatiye mîsogerkirin û wiha got: "Wekî tê dîtin di vê bûyerê de polîsan destûra bi kar anîna vî mafî nedane."




## Polîsan êrîş kir 4 zarok birîndar bûn

**EDENE** - Polîsan êrîşî çalakiya li navçeya Seyhanê ya Edeneyê kir û piştî êrîşa polîsan madeyek neyê zanîn di nava zarokan de teqiya. Di bûyerê de yek bi giranî 4 zarok birîndar bûn.

Li taxa Ovayê ya navçeya Seyhanê ya Edeneyê zarokan çalakî pêk anîn û polîsan êrîşî zarokan kir. Di çalakiyê de polîsan tax dorpêç kir. Dema di bûyerê de komek zarok kom bûbûn, di nava wan de madeyekî neyê zanîn teqiya û zarokek bi giranî 4 zarok birîndar bûn. 4 zarokên birîndar bûn ji aliyê welatiyan ve rakirin nexweşxaneyan û di navbera polîsan û ciwanan de pevçûn derket. Polîsan bi ava şid, bobmbeyên gazê û panzeran êrîş li ciwanan kir û ciwanan jî bi kevir û molotofkokteylan bersiva polîsan da. Pevçûn heta demekê domiya û çalakî li nava taxan bi dawî bû. Li cihê bûyerê jî polîsan lêkolîn kir.

Zarokên di bûyerê de birîndarbûn S.K. (15) li Nexweşxaneya Dewletê ya Edeneyê, F.O. (17) li Nexwexaneya Numune ya Edeneyê , A.Ç. (16) û zarokê bi giranî birîndarbû A.B. (16) jî li Nexwexaneya Balcaliyê ya Zanîngeha Çukurovayê tên dermankirin. Hate zanîn ku zarokên bi navê A.B û A.Ç. hatin ameliyatkirin û hêj taloqya jiyana A.B. heye.

S.K. û F.O. jî piştî dermankirina wan hatin binçavkirin û birin Şubeya Zarokan a Midûriyeta Polîsan.

## Xebatkarê Ozgur Halkê hat girtin

**MÊRSÎN** - Xebatkarê Kovara Ozgur Halkê H.B.'yê ku 2 roj berê li Mêrsînê hatî binçavkirin bi îdiaya "Propaganda rêxistina derqanunî kiriye" hat girtin.

Li Akdenîza Mêrsînê xebatkarê Kovara Ozgur Halkê û 2 xebatkarên Rojnameya Azadiya Welat yên Mêrsînê li ber kargoya MNG hatin binçavkirin. Piştî xebatkarê Ozgur Halkê H. B. û 2 xebatkarên rojnameya Azadiya Welat li Midûriyeta Polîsan ya Mêrsînê îfade dan, sewqî Dozgeriya Komarê ya Mêrsînê hatin kirin. Dozger, piştî îfadeya 3 kesan girt, bi daxwaza girtinê sewqî 1'emîn Dadgeha Sulh Ceza kir. Heyeta dadgehê jî piştî li îfadeyên 3 kesan guhdar kir, 2 xebatkarên rojnameyê serbest berdan û der barê xebatkarê Kovara Ozgur Halkê H.B. de bi îdiaya "Propaganda rêxistina derqanunî kiriye" biryara girtinê da û ew şandin girtîgehê.

# Li Amerîkayê pirseke balkêş

Di dema Serokomarê tirk Gul û Wezîrê Karên Derve yê tirk Davudoglu hê li Amerîkayê bûn rojnamegeran ji Berdevkê Wezareta Karên Derve yê Amerîkayê pirsî; 'gelo kurdên Iraqê dixwazin ku Amerîka PKK'ê wekî 'terorîst' nebîne'



**AMED** - Berdevkê Wezareta Karên Derve yê Amerîkayê Mark Toner di pêvajoya ku Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul û Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Ahmed Davudoglu li Amerîkayê bûn daxuyanî da. Di daxuyaniyê de mijara herî balkêş pirsa ku jê hat kirin bû. Toner di bersiva pirsa balkêş de got haya wî jê nîn e û bi bersiva klasîk a Amerîkayê xwe dubare kir û got ku PKK di nav lîsteya rêxistinên 'terorîst' ên Amerîkayê de ye.

Di daxuyaniya Berdevk Mark Toner de rojnamegerek pirsa; "gelo kurden Iraqê dixwazin Amerîka êdî dev ji hişmendiya xwe ya 'PKK terorîst e' berde" kir. Toner di bersêvê da got ku haya wî ji vê nîn e. Ew nizane ku ev daxwaz ji Amerîkayê hatiye kirin an nehatiye kirin û di bersvivê de daxuyaniyên Amerîkayê yên kilasîk dubare kir û wiha pêde diçe: "Amerîka di nav pergala ku Tirkiye û Iraqê koordîne dike de di nav diyalogê de ye.

Berya daxuyaniyê Serokomarê Tirkiyeyê Gul li ser nigan be jî bi Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama re hevdîtin kiribû û di hevdîtinê de Gul ji Obama xwestibû ku bi awayekî cidî li dijî PKK'ê rawestin û piştgiriyê bidin êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî PKK'ê. Obama jî gotibû 'belê ew cidî piştgiriyê didin Tirkiyeyê'.

Encama dîplomasiya Davudoglu de jî ev hebû. Bi resepsiyonan ji bo dijberiya PKK û kurdan bê kirin kulîsan pêk anî û dan û standinan bedewam kir.

Çend roj berya serdana Gul û Davudoglu Musteşarê MÎT'ê Hakan Fîdan li Amerîkayê bi derdorên muxatabên xwe re havdîtinan pêk anî û vegeriya Tirkiyeyê. Pisporên dîplomasiyê serdana Fîdan wek serdana îstîşareya li dijî PKK'ê nirxandin.

Ev trafîka dîplomasiyê balkêş e. Gelek aliyên vê trafîkê heye. Encax mijara trafîka dîplolasiya Tirkiyeyê PKK û statuya kurdan e. Armanc û hedefa Tirkiyeyê ew e ku kurdan parçe bike û hêzên navneteweyî li ser dijberiya kurdan organîze bike. Lêbelê ku kurd wekî ku rojnameger jî pirsî heke dîplomasiya xwe ji bo hevkariya kurd birêve bibin, ev trafîka ku wekî dolab tê ristin tu encam bi dest naxe.

## Beşîr Atalay bi lez û bez çû Hewlêrê

**ENQERE / ANF** - Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Beşîr Atalay ji nişka ve çû Serdana Herêma Federal a Kurddistanê. Dihat payîn serdana Atalay piştî Misteşarê MÎT'ê Hakan Fîdan a Hewlerê pêk bihata. Ancax geşedanên kirîtîk ên dawî lez da vê serdanê. Fîdan berya ku biçe Hewlêrê çûbûn Amerîkayê û bi hevpîşeyên xwe re hevdîtin kiribû.

Piştî ku KCK'ê biryara bêçalakîtiyê da, trafîka navbera Enqere, Washington û Hewlêrê qet raneweste. Ev demeke li Îmraliyê bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re jî hevdîtin pêk tên.

Balyozê Mezin ê Tirkiyeyê yê Iraqê Murat Ozçelîk di hefteya derbasbûyî de li Hewlêrê bi rayedarên kurd re hat cem hev.

Hat diyarkirin ku Ozçelîk ji bo bingeha serdana Atalay û Fîdan amade bike li Hewlêrê bû. Dê piştî Ozçelîk dê Musteşarê MÎT'ê Fîdan divê biçûna serdanê. Encax Atalay berya wê çû.

Hat ragihandin ku dê Fîdan di nava yek-du hefteyên din de bi rayedarên sereke yên Herêma Federal a Kurdistanê re, di der barê PKK'ê de hevdîtin pêk bîne. Li gorî agahiyan, ji bo Fîdan hemû civanên hevdîtinên bi rayedarên kurd re amade ne.

Her wiha, Wezîrê Karên Hundir ê Tirk Beşîr Atalay jî dabû diyarkirin ku dibe ku ew jî biçe Hewlêrê. Wezîrê Tirk Atalay gotibû ku ew dê di demek nêzîk de biçe Sûriye û Îranê û bi wezîrên hevpîşeyên xwe yên her du welatan re hevdîtin pêk bînin. Ancax li pişt perdeyê çi bû naye zanîn, ancax berya ku biçe Îran û Sûriyeyê, berya ku serdana Fîdan pêk bê bi awayekî lezgîn çû serdana Hewlerê.

Dê di vê hefteyê de heyetek leşkerî ya Amerîkayê ku Fermandarê Hêzên Leşkerî yê Amerîkayê, yê Iraqê serokatiya wê dike dê bê serdana Tirkiyeyê.

Balkêş e ku di trafîka heyî ya dîplomatîk de leziyeke awarte heye. Gelek derdor vê leziyê bi encama diyaloga li Îmraliyê bi Rêberê Gelê Kurd Ocalan û bi BDP'ê ve girê didin.

KURTE NÛÇE

### Di encama teqînê de 2 kes mirin

BRUKSEL

Li Brukselê mala ku welatiyên tirk û Afrîkaya Başûr lê dimînin teqîn pêk hat. Tê texmînkirin ku teqîn ji ber gazê pêk hatiye. Mursel Kose yê ji bajarê Afyonê ye û japoniyek jiyana xwe ji dest dan. Kesê bi navê Mikaîl Şahîn ku ji Îdirê ye û li Almanyayê navê Michel girtiye di bin avahiya ji ber teqinê hilweşiya de ye û ji bo derxistina wî yekîneyên rizgarkirinê bê navber dixebitin. Şaredarê Schaerbeekê Cecile Jodogne jî diyar kir ku teqîn bi kîlometreyan ji dûr ve hatiye hîskirin û encama teqînê de jî yek jê bi giranî 17 kes jî birînar in. Polîs ji ber ku avahiyê de biyanî dimînin bi guman nêzî teqînê dibe û ji pir aliyê ve li ser mijarê lêpirsînê didomînin.

### 2 leşkerên NATO'yê hatin kuştin

QABÎL

Hat ragihandin ku di êrîşa bombeyî ya li başûrê Afganistanê pêkhatî de 2 leşkerên NATO`yê hatine kuştin. Di daxuyaniya ku ji aliyê fermandariya NATO'yê ya li Qabîlê hatî kirin de, 2 leşker di encama teqînek a bombeyekê de mirine. Di daxuyaniyê de di derbarê nasname û berfirehiya bûyerê de agahî nehatin dayîn. Li Afganistanê ji destpêkirina dagirkirina DYA`yê û vir ve sala ku herî zêde hêzên biyanî windahî dayîn îsal e. Ji destpêka salê û heya niha hejmara leşkerên biyanî yên li Afganistanê hatine kuştin ji 530`yan jî derbas kir.

# Li Îspanyayê li dijî girtiyên baskî îşkence

**Orsola CASAGRANDE / BILBAO - ANF**

Her çendî ETA'yê agirbest îlan kiribe jî, hêj hewldanên Îspanyayê nehatine guhertin. Li Baskê 9 kes bi hinceta di navbera ETA û Izquierda Abertzale de rêzanî kirine hatin girtin. Malbatên girtiyan diyar kirin ku hêj zextên dewleta Îspanayayê berdewam dikin.

Xizmên Sandra Barrenetxea ya li Bilbaoyê girtî diyar kir ku ew ji aliyê polîsên spanî ve hatiye tazîkirin, destên wê kelemçe kirine û rastî destdirêjiya zayendî hatiye. Her wiha hat ragihandin ku Sandra di dema jêpirsînê de gelek caran bi gefxwarina tecawizê re rû bi rû maye.

Her wiha Rosa Iriarte ya li bajarê Iruneayê girtî, li ber dîwarekî ku toza spî ya taybet li ser heyî rawestandine. Xizmên Iriarte ragihandin ku polîsan dest û zimanê Iriarte tevizandine û ji wê re her tim behsa îşkenceya ku polîsan li hevalên wê kirî kirine.

Her wiha Ugaitz Elizaran yê li San Sebastianê girtî jî got ku torbeyê plastîk dixin serê wî û wî bê nefes dihêlin. Her wiha hat diyarkirin ku ji ber lêdana li Elizaran dîtina çavên wî di demek kurt de daketiye.

Aniaiz Ariznabaretta ya li Nojo girtî jî diyar kir ku polîsên îspanyol wê tazî kirine, destdirêjiya zayendî li wê kirine û bi tecawizê gef li wê xwarine.

Her çendî delîl û îfadeyên berbiçav yên der barê îşkenceya li dijî girtiyê baskî di dest de hene jî, lê hêj jî dadgehên spanî tiştek nekirine.Îsal herî kêm 21 baskiyên ji aliyê polîsên îspanyol ve hatin girtin rastî îşkenceyê hatine. Bi vê daxuyaniya ku rewşa girtiyan vedibêje li Herêma Baskê nerazîbûnek mezin derxist holê.

# Partiya Karkeran serokê xwe guhert

**LONDON / ANF** - Li Îngilistanê Partiya Karkeran bi hilbijartinek serokê xwe yê nû diyar kir. Di hilbijartinê de her du birayên Millîband berendam bûn. Di encamê de ji endaman birayê biçûk Ed Millîband ji bo serokê Partiya Karkerên Îngilistanê hate hilbijartin. Birayê din Davîd Millîband 5 sal ji birayê xwe mezintir e û di hilbijartinê de têk çû. Partiya Karkeran a Îngilistanê 13 sal li desthilatdariya Îngilistanê kir û di hilbijartina meha gulanê ed têk çû. Li ser vê Serokê Partiyê Gordon Brown îstîfa kiribû. Di hilbijartinê de her du bira Ed û Davîd Millîband li ber hev dan. Birayê biçûk Ed Millîband ji sedî 50,6'ê dengan girt û bi ser ket.

**Peyama guherînê da**

Piştî ancam diyar bûn Millîband spasiya xwe ya ji bo yekitî û guherînî pêşkêş kir wiha got: "Di vê hilbijartinê de rûpeleke nû dest pê kir. Sedema vê jî ev e ku nifşeke nû hatiye ser desthiatdariya vê partiyê. Ev dem dema jenerasyona nû ye û hêvî ev e ku dê vê jenerasyonê ji Îngilistanê re xizmetên mezin bike." bi gotina carek din spas dawî li axaftinê anî.

Ed Millîband (40) xwe wek navê ku kare partiya Karkerên ku bi navê Tony Blaîr û Gordon Brown dihat nasîn biguhêrîne destnîşan kir. Sendîkayan ji naha ve piştgiriya Millîband dikin û payîna wan ew e ku Millîband partiyê vegerîne ser rahekên esasî yê berê. Davîd Millîband Wezîrê Karên Derve yê hikûmeta Partiya Karkerên Îngilistanê bû û wek favoriyê hilbijartinê dihat dîtin. Millîband bi daxuyaniyek diyar kiribû ku heke hilbijartinê winda bike ew dê îstîfa neke.

Rojnameya Guardian jî aşkera dike ku her du birayên Millîband berya hilbijartinê li hev kirine. Li gorî vê kîjan bira têk biçe dê wekî piştgirê veşartî dê di partiyê de dihê xwe bigire.

# Bahozê li Haîtiyê 5 kes kuştin

**PORT AU PRINCEYÊ** - Bahozên tropîk ên di nav xwe de baran û bayeke şidî dihewînin li gelek deverên cîhanê xesarên mezin pêk tînin. Haîtiya ku hêj birîna xwe yên ji ber erdhejê nepêçaye vê carê jî bi bahozê tevlihev bû û di encama vê de 5 haîtî jiyana xwe ji dest dan. Her wiha konên ji bo erdhejê hatibûn vedan jî tev serobin bûn û bi bahozê re çûn.

Dîrektorê Saziya Parazvaniya Sivîl a Haîtiyê Alta Jean-Baptiste li ser encma bahoza li derdora paytexta Haîtî Port Au Princeyê rabûye daxuyanî da. Got ku bahozeke tund roja înê dest pê kir demek dirêj dom kir. 2 jê zarok 5 kes di vê bahozê de jiyana xwe ji dest dan û bahozê bi kêmanî 5 hezar û 800 kon ji cihên wan rakir û bir. Jean-Baptiste vegot diyar kir ku 50 kes jî birîndar bûne. Haîtî 8 meh berê bi erdheja bi hêza 7 hejiya û bi sedhezaran mirov mirin. Konên ku bahozê ew rakirin û birin jî konên mexdûrên erdhejê bûn.

Rayedaran diyar kir ku ev bahoz têkiliya xwe bi bi bahoza tropîk a bi navê "Matthew" nîn e. Li gorî zanyarên mijarê ev bahoz ji ber hewayên serma yên ji aliyê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê û ji aliyê Kanadayê ve tên bi xwera fîşara hewa sar diafirîne û ji ber vê jî bahozên wisa mezin pêk tên.

# Ev îstifaya li Pakistanê balê dikişîne

**ÎSLAMABAD / ANF** - Wezîrê Parastinê yê Pakistanê Abdul Qayum Jatoî ku îdia kiribû artêşa Pakistanê Serokwezîra berê ya Pakistanê Benazîr Buttoyê kuştiye îstîfa kir. Ancax ev îstîfa di nav raya giştî ya Pakistanê de balê kişand.

Wezîr Abdul Qayum Jatoî di daxuyaniya ku da rojnamegeran. Di daxuyaniyê de got ku fonên ji bo artêşa Pakistanê tên tarxankirin ne ji bo înfazên siyasî ne, ew ji bo parastina welat tên tarxankirin.

Serokwezîrê Pakistanê Yusuf Riza Gîlanî ji Wezîr Jatoî xwest ku bi van gotinên xwe dixwaze çi bêje. Jatoî jî di ser vê jêpirsînê re pir dem derbas nebû û îstifa kir. Jatoî li bajarê Kuettayê di daxuyaniya çapameniyê de diyar kiribû ku ew ji bo ku artêş Nawab Sahîb û Benazîr Buttoyê bikujin fonan nadin.

Serokwezîra Pakistanê ya berê Benazîr Buttoyê di meha adara 2007'an de di encama suîkastek de hatibû kuştin. Serokê Eşîra Eyaleta Belucistanê Nawab Akbar Bugtî jî di meha tebaxa sala 2006'an de di şerê nav artêşa Pakistanê û çekdarên eşîretê de hatibû kuştin.

Artêşa Pakistanê ji avabûna Pakistanê û şûnve ku dike 63 sal 3 car derbe kiriye. Di çapameniya Pakistanê de tê gotin ku hikûmet di felekata lehiyan de ne serketîbûye û ji ber vê jî dê artêş derbe bike. Encax analîst vedibêjin ku di rewşa heyî de şert û mercê ku artêş darbe bike nîn e.

www.arsivakurd.org

# Bedena jinê kirin qurbaniya reytîngê

Fîlmê 'Sûcê Fatmagulê çi ye?' rastî bertekên jinan hat û jinan got ku ev fîlm êrîşeke cidî ya li ser bedena jinê ye, ev ne cureyeke zayendî ye. Jinan destnîşan kir ku ev tişt tê wateya îhlalkirina mafê jinê û divê fîrma ji jinan lêborîne bixwaze

**AMED** - Ev demeke li ser fîlmekî nîqaş tên kirin. Fîlmê bi navê 'Sûcê Fatmagulê Çi ye? ji hêla hemû kesan ve hate nîqaş kirin. Lê ji bo fîlm reytîngan zêde bike beşa wê ya tecawizê zêdetir derket peş. Û li ser wê beşê gelek nîqaş hatin kirin. Ev tişt bi armanca reklamê hate kirin. Niha li her qadê tecawiza li hemberî jinê tê nîqaş kirin û di vê demê de ji fîlmek bi wî rengî tecawiza li hemberî jinê meşrû û normalîze dike derket holê.

Tecawiz ne cureyekî zayendî ye, êrîşeke cidî ya li ser bedena jinê ye û îhlalkirina mafê jinê ye. Bi taybetî medya êrîşa cinsî û tecawizê normalîze dike. Di fîlmê de beşa tecawizê wekî amûra pornografiyê hate bikaranîn. Ev tişt berhemên çanda tecawizê ye û di her beşa jiyanê de xwe dide der e. Her wiha çanda tecawizê bi riya medyayê û bi taybetî bi fîlman bêtir xwe xurt û meşrû dike. Her wiha ev çanda tecawizê ev qas xwe meşrû dike ku di nav civakê de nîqaşa kî baş tecawizê dike û kê baş rastî tecawizê tê, tê kirin. Ev tişt bi vê fîlmê derket holê.

Jinan li dijî vê bertek nîşan da û gotin ku êrîşeke cidî ya li ser bedena jinê ye, ev ne cureyeke zayendî ye. Ev tişt tê wateya binpêkirin û îhlalkirina mafê jinê. Her wiha jinan daxwaz kir ku divê fîrma ji jinan lêborîne bixwaze û divê raya giştî jî li dijî vê bertek nîşan bide.

**Ji bo reytîngê…**

Ji Zankoya Ragihandinê ya Zanîngeha Galatasarayê Doç. Dr. Hulya Ugur Tanriover, di axaftina xwe de bal kişand li ser êrîşa cinsî û diyar kir ku têkiliya zayendî nayê wateya tecawizê. Doç. Dr. Tanriover, got ku li Tirkiyeyê gelek kes dema xwe bi rêzefîlman derbas dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di gelek rêzefîlman de pirsgirêkên civakê tê vegotin, lê gelek caran jî rêzefîlm dibin amûra pornografiyê. Fîlma 'Sûcê Fatmagulê çî ye?' bi reytîngeke mezin destpê kir. Di sehneya ku 4 deqîqeyên tecawizê nîşan dide heye. Ev sehne di malpera înternetê de rekoreke şikand. Nîqaş tenê li ser tecawizê bû. Li ser mexdûr û mexdûra ku bi tecawizkarê xwe zewicî re bû nebû, an jî zarok rastî îstîsmariyê hat nebû."

**Têkiliya zayendî û tecawiz**

Tanriover, da zanîn ku gelek mijarên civakê yên wekî, zewaca zû û ya bi zorê, kuştina bi hinceta namûsê, berdêl û hwd bi rêzefîlman tê rojeve û dibe sedema nîqaşan. Tanriover, destnîşan kir ku beşa tecawizê ya fîlma Fatmagulê sosretek derxist holê û lê mêrên xerifî û cîvaka qirêjbûyî bûn amûr. Tanriover, wiha got: "Pirsgirêka bingehîn tecawizê ne têkiliya zayendî ye. Di serî de çawa dibistanan dersên matematîk, dîrok tê dayîn divê li ser dersên têkiliyên zayendî jî bisekinin. Her wiha em bangî senarîstan dikin ku bila bi zanebûn vî karî bikin û li gorî rewşa civakê tevbigerin. Peyamên bi wî rengî civakê xirab dike."



**Wekheviya şîdet û seksê**

Ji Fîlmmorê Melek Ozman, destnîşan kir ku ji bo reytînga fîlmê ev beşa tecawizê derket peş, ji ber ku şîdet û seks her tim reytîngên zêde digire. Ozman, got ku sehneya tecawizê heke ev qas reytîng bigere divê mirov li wî welatî baş bifikire.

Ozman, got ku seks ev qas ji şîdetê re wekhevgirtin xetereye û ji ber ku her roj tacîz û tecawiz pêk tê. Ozman, got ku divê kesên ku wê fîlmê çêdike lêborîna xwe ji civakê bixwaze.

**Meşrûkirina tecawizê**

Parêzer- KaosGl Yasemîn Oz, daxuyand ku derxistina beşa tecawizê tê wateya meşrûkirina tecawizê, maf dîtine. Oz, got ku li şûna ku bibe sedema nefretê, bû fantaziyek.

Parêzer Hulya Gulbahar, da zanîn ku Tirkiye di rewşeke şîzofrenîk de ye û wiha axivî: "Di nav civakê de sehneyên hevmaçkirin, têkiliya cinsî û bikaranîna balîfan û hwd. tê nîqaşkirin û her wiha ji bo fîlmê Fatmagulê kampanyaya hate destpêkirin, di kampanyayê de sehneya tecawizê heta nîşandan. Li şûna ku di nav civakê de pirsgirêkan bi fîlman derxin holê û çareser bikin, civakê dikişînin cihek din. Divê tecawiz di her qadê de bê nîqaşkirin û bê teşhîrkirin, lê ne wekî bi pornografiyê meşrû bikin." Îlkay Ulku, ji Platforma li dijî Şîdeta Cinsî, destnîşan kir ku nêzîkatiya medyayê ya li hemberî jinê nîşan dide ev fîlm. Ulku, di axaftina xwe de bal kişand ser nîqaşên Hulya Avşar û Beren Saatê û got ku ev tişt jî tiştek cuda ye û bandora serdestiyê ya li ser jinê nîşan dide.

# 'Bersivê bidin bêçalakîtiyê'

**MÊRDÎN** - Bi sedan jinên beşdarî meşa Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) li dar xist bûn, balkişandin ser girîngiya biryara bêçalakîtiyê ya PKK'ê û xwestin operasyonên leşkerî bên rawestandin, her wiha biryara bêçalakîtiyê bê bersivandin.

DOKH'ê bi armanca balkişandina ser biryara dirêjkirina bêçalakîtiyê ya PKK'ê û ji ber avahiya BDP'a Qoserê ber bi Qada Cumhuriyetê ve meşek li dar xist. Di meşê de jinan panqarta "Em dê destûrê nedin mirinan, em aştiyê bînin" vekirin û dowîzên "Bila operasyon bên rawestandin", "Em pêvajoya diyalogê slav dikin", "Aştî", "Jin aştiyê dixwazin" hilgirtin. Piştî meşa li ber Qada Cumhuriyetê bi dawî bû daxuyanî xwend.

Elîk Yilmaz, diyar kir ku biryara bêçalakîtiyê ya PKK'ê alîkarî daye pêvajoya aştiyê. Yilmaz, balkişand ser operasyonên di pêvajoya bêçalakîtiyê de zêde bûne. Elîk Yilmaz, da zanîn ku lazime operasyonên li herêmê tên meşandin bi bez bên rawestandin û ji bo aştiyek mayînde jî pêvajoya muzakereyan bê destpêkirin.




## UN bo çareseriya pirsgirêkên jinan xwe amade dike

**DIHOK** - Ev sê meh in Neteweyên Yekbûyî (NY) bi riya rêxistina UNHSP û saziyên peywendîdar ên Iraq û Kurdistanê, bo kêmkirina tundûtûjiya li hemberî jinan li Iraq û Herêma Kurdistanê hewl didin planeke 4 salî deynin.

Endama Parlamentoya Iraqê li ser lîsta PDK'ê li Fraksyona Hevpeymanî ya Kurdistanî Cula Hacî ragihand ku civînên danîna vê stratejiyê li Kurdistanê hatin sazkirin û wiha got: "Bo danîna vê stratejiyê jimareke civînên berfireh li Hewlêrê hatin lidarxistin. Ev civîn ligel çalakvanên jin û saziyên civaka sivîl û wezaretên peywendîdar li Iraq û Herêma Kurdistanê hatin sazkirin.

Dema UN xwest civînên danîna vê plana stratejîk li Kurdistanê saz bike, daxwaz kir ku civînan li civata bilind a jin û afiretan girê bidin, lê ji ber nebûna tu civatên bilind li Kurdistanê ev civîn li Rêveberiya Giştî ya Şopandin û Nehîştina Tundûtûjiyê dijî Jinan li Kurdistanê hatin girêdan."



## Jinan desra kurdî da

**AMED** - Tevgera Jinên Azad û Demokrat ji bo zimanê zikmakî bibe zimanê perwerdehiyê, her cih bi awayekî sembolîk kir dibistan.

Piştî boykotkirina dibistanan jinan her cih bi awayekî sembolîk kir dibistan. Endamên DOKH'ê li avahiya BDP'a Baglara dersa zimanê kurdî da. Endamên DOKH'ê diyar kirin ku heta zimanê zikmakî di dibistanan de bibe zimanê perwerdehiyê dê her cihî bikin dibistan. Dibistana DOKH'ê îro li avahiya BDP'a Baglara dest pê kir. Jinan li vê derê saetekê bi kêfxweşiya kurdî perwerde dîtin. 50 jin bi zarokên xwe beşdarî perwerdehiyê bûn. Jinan di dersê de alfabeya kurdî dîtin. Bi taybetî tipên qedexe bi kar anîn. Mamosteya ku ders da piştî dersê spasiyên xwe ji jinan re kir. Li ser navê Meclisa Jinan a BDP'ê Zekiye Guler axaftinek kurt kir û wiha got :"Em dê heta zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê her cih bikin dibistan. Ji bo perwerdehiyê em dê dibistanên xwe de perwerdehiya xwe bidominin."

# Şaredariya Akdenîzê Navenda Şêwirmendiya Jinan a Îştarê vekir

**MÊRSÎN** - Şaredariya BDP'a Akdenîzê ya Mêrsînê di çarçoveya xebatên xwe de Navenda Şêwirmendiya Jinan a Îştarê vekir. Parlamentera BDP'ê ya Mêrdînê Emîne Ayna, di merasîma vekirinê de diyar kir ku jin encax bi avakirina rêxistinbûna li dor saziyên wiha azad bibin.

Şaredariya Akdenîzê, li 6 navendên cuda dê 18 kursên cuda bide û ji bo jinên li Mêrsînê dijîn îmze avêt bin projeyek mezin. Şaredariya Akdenîzê, di bin baneya Midûriyeta Karên Civakî û Çandî de ji bo avakirina mijarên hiqûqî, derûnî û têkiliya di nava malbatê de bi merasîmekê li taxa Camîîşerîf ya li navçeyê Navenda Şêwirmendiya Jinan a Îştarê vekir.

Parlamentera BDP'ê ya Mêrdînê Emîne Ayna, Berdevka Meclisa Jinan a BDP'ê Şukran Dîkme, Endama MYK'ê ya BDP'ê Nursel Aydogan, Serokê BDP'a Mersînê Cîhan Yilmaz, Wekîlê Şaredarê Akdenîzê Sabahattîn Atsiz, endamên meclisa şaredariyê, ÎHD, SDP, GOÇ-DER, MKM, nûnerên Komeleya Xirîstiyanan a Mersînê, derdorên zanebûnê, komeleyên jinan û gelek kes beşdar bûn. Bi sedan jinên bi zarokên xwe beşdarî merasîmê bûn bi tîlîliyan û stranên kurdî govend gerandin û jinên dengbêj klam gotin ev jî demên hêstiyar bi beşdaran re çêkir. Endama Meclisa Şaredariya Akdenîzê Fatma Gul Demîrtag, diyar kir ku xeyalên xwe yên avakirina navenda şêwirmendiya jinan pêk anîne û ji bo pirsgirêkên jinan çareser bikin jî di gelek mijaran de dê alîkariyê bidin wan.

Emîne Ayna jî, diyar kir ku hişmendiya serdest a zilam rê li ber şîdeta li hemberî jinan vedike û wiha got: "Li Tirkiyeyê gelek jin rastî şîdet, tacîz û tecawizê tên û gelek ji wan jî ji tirsan bûyeran nabêjin. Rêjeya vê yekê ji sedî 98 e. Eger jinên bêdeng biaxivin dê gelek nivîs û romanan bên nivîsîn. Lazim e jin zanibin ku ev ne çare ye. Sedema van bûyeran jî newekheviya desthilatdar diafirîne."

Ayna, xwest ku berî her tiştî jin ji bîrdoziya pergalê rizgar bibin û wiha got: "Dewlet, hikûmet û hin partiyên muxalefet pirsgirêkên biçûk dikin wekî pirsgirêkên sereke. Em hêj li welatê ku bi pirsgirêka poşiya serê jinan re mijûl dibin de dijîn. Ji ber vê yekê Navenda Şêwirmendiya Jinan gelek girîng e." Ayna, da zanîn ku ev navenda jî dê wekî navendê wan ên din bi pirsgirên jinan re eleqeder bibe û ji bo çareseriya hemû pirsgirêkan dê têkoşînê bimeşîne.

# Şerê Yekemîn



Saet pênc û nîvê sibehê bû. Tenê stêrkek li esman xuya dikir. Her çendî em di meşa xwe de bi hişyarî jî tevdigeriyan jî, me nedizanibû ku dijmin derûdora me girtiye. Bêhnekî em sekinîn. Ji nişkê ve dengbi çekan ket

GULAN BOTAN

***Laşê bêserî hatin ekranê! Serî li derûdora laşan bûn. Min got qey hinek dîmenên filman amade dikin, lê ne wisa bû!***

Şoreş ji bo min xewnek bû. Azadî ji bo min armanc bû. Lewre di her rabûn û rûniştina xwe de min behsa welat, gerîla û şer dikir. Sal 1988'an bû. Şoreşa Rizgariya Neteweya Kurdistanê ku agirê zayîna wê nû belav bibû, bi germahiyekî bêsînor dihate guftugokirin. Li kolanan li bajaran li gundan her roj gel di nava xwe de behsa şerê gerîla dikirin. Wê demê ji wan dihat gotin; Apoger û hinekan jî digot 'yên ji me çêtir in'. Ez jî di wê demê de ciwanek bûm. Heskirineke min ê mezin çêbû ku ez tevlî refên şoreşê bibim. Lê wekî ku herkes dizanî di wê demê de zêde tevgera hevala nebû. Ji ber ku hîn gel di nava wê tirsa ku dijmin bi darê zorê di nava wan de dabû rûniştandin.

Wateya çûn û hatina hevalan jî zêde li gundê me nebû. Fikrê min her tim belav bû û ez difikirîm. Ez ê çawa xwe bigihînim serê çiyan. Xeyalên min dûr diçûn. Min carna xwe wekî bazêkî didît, ku li ser çiyayê Cudî difiriyam û li ser lûtke ya wî datînim. Demek bi vî rengî derbas bû. Min berê xwe da Stenbolê. Lê ez çi biçim... Min nefret ji xwe kir. Dinya li ber çavên min tarî bû, ji ber ku li wê derê tu rûmet nedidan kurdan. Berde kurd heger bizanibûyan ku tu 'Rojhilata Anadolê'yî, wate bakurê Kurdistan kesekî kar nedida.

Bi çavsoriyekî tijî kîn mirov temaşe dikirin. Lê tişta ku herî bandor li min kir ev bû. Şevêkî dema em li ber ekranê televîzyona tirkan rûniştibûn, laşê bêserî hatin ser ekrana. Serî li derûdora laşan bûn. Min got qey hinek dîmenên filman amade kirin. Lê ne wisa bû. Ew dîmen bi rastî bûn. Ew serê gerîla bûn. Piştî ku ez tevlî bûm min navê yek ji ew hevalana jî fêr bûm. Ew serî yek jê yê heval Adil bû. Min ji wê rojê xwe nema girt. Ez hema vegeriyam gund. Min ji bavê xwe re got; belkî ev cara dawî be ku em hevûdu bibînin.

Malbata me zêde di nava ramanên kemalîzmê de nehatibû helandin. Ji ber ku di rabûn û rûniştandinên xwe de wan silav didan Çiyayê Cudî. Lewre aliyê welatparêziyê her li pêş bû. Bavê min jî wiha bersiv da;

Kurê min rê li pêşiya we vekiriye. Hûn çawa ji bo xwe baş dibînin. Wisa bikin.

Bi wê dilşewatiya xwe û xemginiyekî ku ez di vê nivîsê de nikakin binim ziman; lewra hestê min tevde wekî di nîva agir û çiyayekî berfê de mabû. Min dest bi lêgerînê kir. Dem payîz bû, meha Îlonê bû. Daran kirasê xwe ji xwe kirin. Min mîlîsan dît û ez bi wan re axifîm. Her çendê min partî bi şêweyekî zanistî jî nas nekiribû. Lê ez di wê baweriyê de me ku xewnê mirov çi bin ew ê bixwazê di jiyanê de heyanê ku derfetê wî hebe pêkbîne. Ji 11'ê îlonê heta 16'ê îlonê em li malekî man. Gelek guman di serê min de diçûn û dihatin. Em dihizirîn gelo ev mîlîs me nexê dest dijmin em ê kengê ji vir biçin?.. Ber êvar bû mîlîs hatin û em ber bi çiyan ve ketin rê de.

Ez gelek keyfxweş bûm û hîn bêhtir dema em gihiştin gerîla û bi çavan me ew dîtin. Lê bi rastî tiştek bi min nexweş hat ku ew jî ev bû; gerîla gelek pirsan dikin. Tu ji ku yî? Navê te çi ye? Ji kîjan gundî yî?.. Min hinekî bêhna xwe veda, lê nalînek bergohê min ket. Min temaşekir ku sê heval birîndarin. Di wê tariyê de firmêsk ji çavên min hatin xwarê, hestên min serûbin bû, agir bi dilê min ket. Min di hundirê xwe de got; gereke ez tola va hevalan hilînim. Xwîna ku rijandine ez ji cendekên dijmin

Peyale bi peyale bigrim. Min destê xwe dirêjî riwê xwe kir û firmêskên xwe paqij kirin. Min serê xwe danî ser çenteyê xwe li asîmanan temaşe kir. Stêrk wekî pezekî bêşivan di bedena asîman de diçirûsîn. Çiyayê Cudî jî bi bejn û bala xwe wekî xortekî çardeh salî bû. Qet kalbûn lê nedixuya û ba taybet di wê mehê de xurt bû. Berf zêde nema bû. Tenê di bilindahiya çiyayan de kêmek hebû. Berê ku çivîk û bilbil awazê xwe bi xwunîn dengê; rojbaş hat. Em rabûne ser xwe. Piştî xwarin û vexwarinê hevalekî çek anîn û bi me dane nasîn. Ev kelaşnîkof e..., Ev BKC ye...Ev bisiving e...

Me çek û rextên xwe girtin. Pratîgî ketin çiyayê Cudî qada şer. Bi grubek hevalan re em ber bi çiyayê Cudî ve çûn û li cihekî ku jê re dibêjin. Girê Hirmo. Em lê sekinîn. Piştî ku me şevbêrka xwe bihurand, me dest bi xewê kir. Sibehê heval ji xew şiyar bûn. Hevalê Sefkan bi xemginiyeke ku lê diyar bû, rûnişt û wiha ji me re got;

Hevalno min xewnek dît. Min dît ku em hemû bi hev re ne. Ken li ser lêvê me ye. Bi hev re yariya dikin. Lê ji nişkêve, mij û dumanek çêbû. Keskesî nabîne... Em tev de li hev kom dibûn û ji her aliyê ve gule wek kevirên agirîn ku ji devê volkanê derkevin bi ser me de dibariya. Min hew xwe nedît destê min li tiştekî germ ket. Heya wê demê min nizanî çi ye. Lê dema ku min destê xwe anî ber çavên xwe, min fêmkir ku rûyê min di nava xwînê de maye. Ez birîndar diketim.

Bi wî şêweyî hevalekî din jî wek wê xewnê, xewnekî dîtibû. Lê belê, şerm dikir ku xewna xwe bibêje. Lê me hemûyan a xwe xiste yek ku bêje û got;

Gelî hevalan ez naxwazim dilê we bi xewna xwe ve bihêlim. Bi kurtayî min didît ku em ketin şer. Gule li ser çeka min nedima, ji pişt min gulek dihat û di singa min de bi cih dibû. Tişta ku tê bîra min, min çend hevok digotin û min xatirê xwe dixwest. Ez şehîd diketim.

Bi rastî jî em ketin nava gumanan de. Me li hev temaşe dikir. Deng ji kesekî derneket. Bêdengiyeke sar hebû. Hinek hevalan ji ber kela hestan titûna xwe derxistin û cixare li dûv cixarê kişandin. Her çendî ew xewn jî bûn, nedixwestin ku bawer bikin. Piştî ku em bi hev şêwirîn şûna ku em lê diman me bi cî hişt. Navberêk tê re derbas nebû, dijmin Girê Hemo dan ber hawanan. Em wê demê gihiştibûn Sirta Hesena, beranberî deriyê Dêra Kemalî ê ku li ser deştê ye. Tiştek nebû em bixun. Saet 12.00'ê nîvê şevê bû. Hevala got em ji vir jî biçin. Her kesek ji me meraq dikir, gelo çi heye lê di vê saetê de. Me di cih de amadekariyên xwe kirin û em bi rê ketin. Meşekî dûr û dirêj di bin tava hêyvê de em meşiyan. Te digot qey ne şev e. Ez hinekî li pêş hevalan bûm. Tiştekî ku diçirûsî hate ser rûyê min. Min lê niherî ew kêzikekî ku bi şevê ronahiya wan heye bû. Min ji xwe re digot;

Gelo ev çi dixwaze bibêje. Qey kes li van waran nemaye. Lewra ew bi xêr hatinê li me dike yan dixwaze bibêje ezê rêka we ronî bikim.

Saet pênc û nîvê sibehê bû. Tenê stêrkek dihat xuya. Her çendî di meşa xwe de em bi hişyarî jî tevdigeriyan, lê me nedizanibû ku dijmin derûdora me girtiye. Bêhnekî em sekinîn. Ji nişkê ve dengê çekan hat Gule wekî ku tovê genim biçinî bi ser me de barandin. Erdê kî rût bû, mirov nikarîbû xwe biparêzî jî. Gelek heval nû bûn. Zêde şer nedîtibûn. Dengek bilind bû û got; Xwe bavêjine erdê. Me hemû ya bi hev re xwe avete erdê.

Te digot qey em aşiqê axê bûne û em wê bi çekan radimusin û bi guleyan dixemlînin. Gule ji her hêlî ve dihatin; paş, pêş, çep, rast... Di nava wan de wekî gêja li min hatibû. Min berê xwe da aliy ê ku gule ji pişt min ve dihatin. Hîna ez zêde nemeşîbûm. Hevalekî ez girtim û got: Bi sekne tu yê bi ku ve biçî? Min jê re got: Ez ê herim cem hevalan. Wî bersiva min da û got: Ew ne heval in heval Cihat. Ew jî dijmin in. Were bi min re be û ji min dûr nekeve.

Ji her hêlîkî ve bizotê agir dihatin. Her hevalek li cihêkê bû, li şûnêkî bûn. Barê min hinekî giran bû. Lê dîsa min şerê xwe dikir. Me hewl da ku em xwe ji çemberê rizgar bibin. Hinekî em ber bi jor ve çûn hêza me zêde nemabû û bi taybet piştî ku sê hevalê me li wir şehîd ketin. Lê her yekî hevalê me wekî gurê har lê hatibû.

Xwîna hevalên şehîd bi dest û cilên me ve hişk bûbû. Her ku me çav lê dikir, hêrsa me hîn bêhtir zêde dibû. Lê çi bibêjim. Her pakrewanek, her şehîdekî me ku xwîna xwe rijandiye ser vê xaka pîroz, ew ê rojek were û destanê wan ê qehremaniyê were nivisandin. Ew her sê heval qet ji bîra min naçin. Belkî demê ez wan hevokan dibêjim pir bi hêsanî tînim ziman. Lê ew bi kela hinavên min, ji kûrahiya kezebê bi zorê derdikevin. Li milê din, eynî van hevalên ku xewn dibînin, birîndar bûn. Şer giran bû.

Guleyê min zêde nemabû. Hevalekî me yê birîndar mabû. Min ew jî dît. Birînê her sê hevala kûr bû, lê dîsa jî bi coşekî mezin dimeşiyan. Hinekî me xwe ji çemberê dûr xistin, hevalekî ji wan zêde nikarîbû bimeşe. Em du heval ketin ber pala wî de û me bi xwe re meşand. Em gihiştin binya gundekî zêde ne mezin bû. Malên wî kevnare bû.

Te digot qey ev sedsale hatiye avakirin. Bênderê kunciyan jî li nêzî gund serê xwe hildabûn. Rewşa hevalên me yê birîndar ber bi xirabûnê ve diçû. Lewra hevala ku emê hevalê Sefkan de nava bênderên kunciyan de veşêrin. Lê me nepejirand û me got em hinekî din wî derbixin ji ber ku şopa xwînê li dûv me diyar bû.

Saet bibû sisê û nîvê şevê. Yan em ê xwe ji wir dûr bixin yan jî şehadet li benda me hemûyan e. Di wê navberê de ez li ber pala hevalê Sefkan de bûm. Bi deng nizmiyekî bi hev re diaxifin. Her çendî gelek xwîn ji canê wî çûbû, lê dîsa jî dixwest bi min re riya xwe bidomîne. Lê zêde nema dikarîbû. Lewra me ew li şûnekî veşart û du bombe danê. Lê wî xwest ku ez pê re bimînim. Hevalan ji min pirsî, çima hevalê Sefkan vê daxwaziyê ji min dike. Bi rastî min nizanîbû çi bersivê bidim? Lewra min got; .ez û hevalê Sefkan du rûpelê gulekî ne. Dergehê şarêkî ne. Ava çem û rûbarekî ne. Du tîpên navêkî ne. Giyanek û du bedenin. Du dilopê ava kaniyekî ne. Du firmêskên çavekî ne. Lê dîsa jî em hevalê hevûdu ne.. Min jî xwest ku ez li cem wî bimînim. Lê hevala nepejirand û me ew bi cî hişt û me rêka xwe domand. Şefaqa sibehê diyar bû. Zerîqeyên rojê hêdî hêdî ji ser çiyan ve derdiketin. Em jî mecbûr man ku em xwe ji ber çavan veşêrin.

Di nava daran de me xwe veşart. Heya êvarê me ne av, ne cixare vexwar. Ji bo ku em xwe xilas bikin, aramiyekî gelek mezin dihat xwestin. Ez bi vê sekname zêde neêşiyam. Tişta ku ez pê êşiyam ew bû ku hevaleki birîndar bi me re bû. Lê qet jê deng derneket. Te digot qey, ew birîn di canê wî de nînin. Min bi dengekî nizim jê pirsî: Heval ma qey tu naêşî?

Ew jî wiha bersiv da min û got: Hevalê Cîhat birîna min gelekî dêşê. Lê dema ku ez li wê temaşe dikim ez jibîr dikim. Şivanên ku nêzî me bûn, berê xwe dan gund. Êvarê perd ên xwe yê reş li ser xwe da berda. Hêdî hêdî em bendewarê wê bûn. Belkî jî bo gelekan şev tê wateya tarîtiya jiyanê ango mirina bi lez, lê ji bo me şev mizgîniya hebûnê ye. Me bi baskên teyrekî şikestî, şalûrekî bêziman ew hembêz kir. Ji ber ku şev kirasê gerîla ye û tê de her şahî û kêfa xwe dike. Ew şer, şerê min ê yekemîn bû. Ji bo min, bû ezmûna herî mezin di jiyana gerîla de.



# Şervanên azadiyê -II-

HAMÎD DÊRIK

**Bi teqandina guleya yekemîn re her tişt ji hev cuda bû, tirs û mêranî, mirin û jiyan, bêdengî û xirecir. Guleyên ku ji devê lûleya çekan derdiketin ne dipirsîn dê bi ku ve biçin û dê li kî bikevin**



Dema guleya yekemîn diteqiya û dengê topên tangê, hewan, katûşe û bombeyan, ji jor ve jî pirepira kobreyan destpêdikir hemû hevalên ku cihê xwe di nava şer de digirtin, bi hev re û mîna yek giyanî û yek dilî, parastina vê jiyanê dikirin. Qada şer ji mirovan re wekî dîmen û wêneyekî ku di nava hemû kêliyên xwe de rastiya jiyana gerîla û wateya berxwedanê dihewandin. Ew jiyana ku ti wêneçêker nikarin wê xizbikin û rastiya wê raxînin li ber çavan. Hevalan hemûyan wekî xeleqeyan hevdû diparastin û her hevalekî biqasî ku xwe diparast, bi qasî wê û zêdetir jî hevalê li kêleka xwe jî diparast. Dema ku gule ji her milî ve diteqiyan û wekî baranê dibariyan. Li beramberî vê yekê xweparistin bi serê xwe karekî pir zorbû. Lê hevalan ji her milî ve xwe di çeperên xwe de asê kiribûn û candidan lê çeperên xwe bernedidan. Hemû çeperên ku me girtîn jî hevdû diparastin û wekî bêbelûnkan ji jêr de berû jorê rêzdibûn. Çeperê me çiqas ji hev ve nêzîkbûn jî lê ji ber ku em windahiyan nedin me zêde tevgera bi aşkera nedikir. Lê car caran bi dizîkan me hevdû temaşe dikir û li rewşa hevdû dipirsî. Di çepera li pêşiya me de sê heval hebûn. Yek ji wan hevalê Mehsûm bû, ew jî bi eslê xwe ji Rihayê bû û hevalê din jî navê xwe Rênas bû ew jî bi eslê xwe ji Başûrê Rojava bû û ji Efrînêbû. Lê hevalê sisiyan hevalê Yeşar bû ew bi xwe jî, ji Colemêrgê bû.

Dema ku guleya yekem teqiya û pêrepêre Kobrayê jî li me dida û li beramberî me jî topê hewan, katûşa û tangan dihate avêtin. Di nava wê xire cirê de mirov ne dizanî ji ku ve dengê guleyan tê û ji kîjan milî ve diteqin. Her sê hevalê li pêşiya me cihê xwe digirtin hemû êrîşê dijmin û nûkeran yek li pey yekê dişkandin û nedihiştin ku dijmin xwe nêzîkî çeperê wan bikin. Birastî mêrantî û cesareta wan hersê hevalan hêz û hêvî dida hemû hevalan. Di eynî wê demê de tirs û xof dikire dilê dijminan de.

Qederek ji şer û pevçûna giran derbasdibû lê barê wan hevalan girantirdibû. Ji ber ku dijmin ji hemû milan ve êrîşî li me dikir. Di wê navberêde me dengek ji wê çepera wan hersê hevalên ku li pêşiya me bûn bihîst. Li ser vê yekê me du hevalan xwe bi bayê bezê gihande çepera wan hevalan. Dema ku em gihiştin cem wan hevalan me hew dît ku hevalê yeşar li erdê dirêjkiriye û xwîn ji çoka wî diherike. Wê demê hevalek bi wî ve mijûl dibû û hevalê din di çeperê de şer dikir û hatina leşkeran astengdikir. Me herdû hevalan hevalê Yeşar di nava destê xwe de hilgirt û me berê xwe da cihê ku em jê hatîn. Dema ku em bi rê ve jî dimeşiyan me xwe ditewand ji bo ku em ji dijmin ve xuya nebin. Ji xwe cihê me li serê gir bû û berf jî tê re xwe her der girtibû. Ji ber wê hevalê Yeşar ji serma direcifî û xwîn dilop bi dilop ji cihê birîna wî diniqutî ser berfê û bi xwe re dimenekî cuda li ser rûpelên berfê xêzdikir. Ew jî dîmenê şehadetê bû. Dema ku em gihîştin cem hevalan. Me birîna hevalê Yeşar girêda û ew di nava betaniyekî de pêça û bi parçeyekî nalyonê jî baş pêça, ji bo ku em bi hesanî li ser berfê bixişkînin heyanî ku em xwe bighînin jêrê.

Hevalê Yeşar hevalekî pir bi cesaret bû û çavê wî ji dijmin nedişkest û ji milê hemû hevalan ve dihate hezkirin. Ew bi xwe jî fermandarê komê bû û her tim cihê di eniya pêş de digirt. Xwedî tecrûbeyên mezin bû di warê şer û gerîlatiyê de. Ji ber vê yekê dema ku birîndar ketî û dema destê hevalan de bû jî. Gazî hemû hevalên ku di çeperande şerdikirin dikir û digot: "Lêbidin hevalno lêbidin qet gava xwe bi şûn de navêjin, serkeftin her ya meye- serkeftin her ya me ye". Bjiî Serok APO, bijî kurd û Kurdistan". Dema me hevalê Yeşar li ser berfê dixişikand û me xwe berû jêrê berdida. Dijmin wê gave em li ser berfa spî ya wekî rûpelekî spî ferqdikirin û bi hawan û kobrayan li me dida. Lê ji ber ku em di nava berfê de bûn û berf jî qasî nîv mitrê hebû. Bandora gule û rokêtên top û koprayan li ser me nedikirin.

Bi vê rewşê û vî halî, me xwe berû jêrê berda. Lê di wê navberê de û dema ku me hevalê Yeşar li ser berfê dixişikand, hêzên îxanetkar û bi guleyekî sûîqestê li hevalê Neşet xistin. Ji ber ku gule li dilê wî hevalî ketibû hema biderbekî de ew heval di nava demeke kin de şehîd ket. Piştî wê bi qasî demekî û heyanî ku bandora guleyan ji ser me kêmbû. Em rabûn û me cenazeyê hevalê Neşet anî û me xwe berda jêrê heyanî em gihiştin cem hevalan.

Piştî ku hevalê Yeşar birîdar bû giraniya şer kete ser milê wan hevalên ku di wê çeperê de mayîn. Di encamê pevçûn û şerên giran de herdû hevalê di wê çeperê de cihê xwe digirtin hemû êrîşê dijmin û nûkeran yek li pey yekê dişkandin û wekî du cêwiyê şer bi hev re li berxwedidan û destanên qehremantiyê li ser vê xakê xêzdikirin. Wan bi hev re soza xwe ya ku dabûn vê jiyanê, Rêber APO û şehîdan, heyanî dilopa xwîna xwe ya dawiyê bi cîh anîn û bi hevre wekî du bazaên azadiyê di ezmanê dilê milyonan de bilnd firiyan. Hevalê Mehsûm hevalekî ciwan bû û hîn di destpêka temenê xwe debû. Hevalekî xwedî coş û heyecanekî bê sînor bû. Ji ber wê di her karî de tim dixwest ku cihê xwe di pêş de bigre û xwedî rihê hevaltiya ku ji xwe bêtir ji hevalê xwe hesdikir bû. Hevalê Rênas jî hevalekî ji Başurê Rojava bû û em di sala 1996'an bi hev re derbasî qada şer bûbûn. Ji ber wê min ev heval baş nasdikir û min pir jê hesdikir. Hevalê Rênas hevalekî bejin bilind, por xelek û esmer bû.

Her tim ken li ser lêvê wî bû û xwedî coş û heyecanekî bilind bû. Di şerê xwe de jî mêrxas û egîd bû. Hevalê Rênas wekî hevalê Mehsûm wî jî tim dixwest cihê xwe di yekîneya êrîşê de bigre û hertim dixwest tevli her çalakiyê bibe. Li serê wan lûtkeyên derdorî cihê ku em lê disekinîn. Ji berî nîvro û heyanî ber bi êvarî em di hundirê şer û cengekekî giran de bûn. Ji ber ku ji milekî ve me nikarîbû em roj xwe ji wê çemberê derxînin û ji milekîdin ve jî sê hevalê meyê şehîd hebûn û du hevalê me yên birîndar jî hebûn. Ji lewre me nedikarî em wan bihêlin û biçin. Cidayî hevalê Yeşar hevalê Ziryan jî guleyekî di kemaxa xwe de xwaribû. Hevalê Ziryan bi eslê xwe ji Başûr bû û ji Hewlêrê bû. Dema tarî ket erdê dijmin her der girtibû û bi hêzên xwe yên ku hijmara wan derdorê 5 hezar leşkerî bûn. Cidayî cerdewan û nûkerên bi wan re diketin tevli operasyonê dibûn. Dem ji bo me dereng dibû. Pêwîst bû em di wê şevê de xwe ji qada Çiyayê Spî bikşînin. Ji ber ku mayîna me di wê deşta navbera Çiyayê Spî û Metîna de, ji bo me qet nebaşbû. Ger ku em li wê deştê jî bimana me yê windahiyên mezin dabana û yek ji me ne difilitî. Cebilxaneyê me yê heyî jî kêm mabû. Têra pevçûnekî bi rojekî nedikir û pêwîst bû ku em rewşa xwe ji her milî ve di ber çavan re derbasbikin û li gorî wê biryarekî bidin. Jixwe hemû heval westiyabûn û ew şevek û rojek bû ku di nava wê sir, seqema dijwar de û bê xwarin şerdikirin. Ji ber wê û ji bo ku hemû heval nekevin xeteriyê. Hevalan biryar dan ku em herdû hevalên birîndar di cihekî saxlem de veşêrin û du hevaln jî, li cem wan bihêlin. ji bo li wan hevalan miqatebinbin û hevalê din jî em hemû xwe birengekî saxlem bighînin qada Metîna.

Di destpêkê de tu niyeta me ya hiştina hevalê birîndar nebû. Lê piştî me dizanî ku em nikarin wan hevalan û di riya meşa rojekî û nîvê de bi xwe re bibin. Lewre ji bo ku jiyana hemû hevalan nekeve tehûlikê. Me veşartina wan herdû hevalan baştirdît. Di wê navberê de me hemû hevalan yek bi yek xatirê xwe ji wan hevalên birîndar xwestin û em birêketin. Dijmin her der girtibû û li pêşiya me kemînên xwe li herderî avêtibûn. Ji ber ku armenca wa ew bû ku me têxin çemberê û nehêlin yek ji me sax ji wê derê xilasbibe. Wan texmîn nedikir ku emê di wê şevê de ji Çiyayê Spî derkevin û dilê xwe bi tunekirina me xweşdikirin.

Çiqas ku gelek leşker û nûker jî hatin kuştin û li her derî berf û seqema dijwar jî hebû. Lê hemû hêzên dijmin yên heyî bi şev û roj li cihê xwe bernedan û di nava berf û seqemêde û di kemînande li benda derketian rojê disekinîn. Da ku bi hilatina rojêre êrîşî ser me bikin û me tunebikin. Lê dema ku rojê bi tîjikên xwe xweza ji xewa giran şiyardikir. Me xwe gihandibû serê çiyayê Metîna yê ku ber bi ezmana ve dihilkişiya û me "mîna mûyekî dema ku tu ji nava hevîr dertixîne, wisa me xwe ji wê çembera dijminan derxist û me xwe gihande saxlemiyê".

Lê dilê me di wê navberê de tim li ser hevalê meyê birîndarbû û tim guhê me li ser bêtêlê bû û destê me li ser dilê mebû da ku em rewşa operasyonê fêrbibin. Lê tişta herî em jê ditirsiyan ew qewimî. Ji ber ku dunya şilîbû û dewsa me jî xweş xwiya dikir. Dijmin jî pêhisiyabû ku em ji qadê derketine. Lê dizanî ku birîndarê me hene. Ji ber wê lêgerînekî kûr û fereh li herdeverî dabû destpêkirin heyanî ku çîhê wan herdû hevalên birîndar dîtibûn û ew şehîd xistibûn.

Dema ku me bi riya pêtêlê ev salox bihîst, wekî ku tu aveke kelandî bi ser serê me de bike. Rengê hemû hevalan hate guhertin û her hevalekî xwe da koşeyekî û bêdengî li her deverî serdestbû. Di wê navberê de wêneyê hevalê Yeşar dihate ber çavê min, dema ku me ew li ser perfê dixişikand û dema ku gazî dikir û digot: "Hevalno! Şerbikin wekî mêran, wekî şêran gavê xwe bi şûn de navêjin wê serkeftin her ya me be". Hevalê Yeşar hevalekî kevin bû û ew demekî dirêj bû ku cihê xwe di nava gerîla de digre û ketibû nava gelek şeran de. Di vî şerê ku hatî meşandin de jî xwedî cihekî taybet û sereke bû.

Dîmenên vî şerî bi xwe re destan û evsaneyên zindî û bêhampa xêzdikirin. Ji lewra dîmenên wî şerî di hizrê her hevalekî de xwe bi cîh dikirin. Rast e em hemû heval ji nava wî şerî derketin û me xwe gihande saxlemiyê. Lê şehadeta wan hevalan li ser me pir giranbû û hîn zêde di hundirê me de kîn û nifret li hemberî dijmin û nûkeran mezintirdikir û soza tolhildanê bi me re mezintir dikir. Ji ber wê yekê her hevalekî dixwest heme bikeve nava tevgerê û li kuderê bibe bile bibe êrîşî li ser dijmin bike. Heyanî ku ew dem hat û hemû hevalên ku ji Çiyayê Spî hatin, careke din berê xwe dane çeperê xwe û hêzên dijmin yên ku li wan deveran bi cîh bûwîn di nava agirê kîn û nifreta dilê xwe de şewitandin û ew tar û mar dikirin.

Êdî ne sir û ne serma û ne hêzên dijmin wê gavê dikarî li pêşiya hêzên gerîla bigirin. Roj roja hesab xwestinê ye. Ne mirin û ne jî tirs dikare li pêşiya şapeya hestên tolhildanê bisekine. Ji ber vê hemû çeperên dijmin yek bi yek li ber vê coş û heyecana hevalan nikarîbû li ber xwe bidin û yek bi yek diketin. Hevalan di van çalakiyan de tola şehîdên Çiyayê Spî û hemû şehîdan hilanîn û waneyekî ku tu caran neyê ji bîrkirin raberî dijmin û nûkeran kirin. *(Dawî)*

## Pîçên ziman

Îro li her aliyên dinyayê kurd hene. Kurd danûstandinên xwe bi milet û gelên cuda cuda re danîne. Bi wan re zewicîne. Bi wan re hevkariyê kirine. Bi wan re danûstandinên bazarî kirine. Çanda xwe dane wan, çanda wan wergirtine. Ango hevpariya çandî kirine.

Kurd bi milet û gelên cuda cuda re pêwendî danîne. Zimanê wan hîn bûne, zimanê xwe hînî wan kirine. Biborînin min çewt got; mixabin û sed mixabin kurdan zimanê xwe hînî kesî/ê nekirine. Zimanê xelkê hîn bûne, hîn kirine lê zimanê xwe hînî kesî/ê nekirine.

Mêrê Kurd dema ku jineke ji tirkan aniye ji xwe re û li xwe mar kiriye; ango malbateke ji xwe re ava kiriye; mala mêrê kurd wekî mala tirkekî be, danûstandin, axaftina bi zarokan re û bi giştî liv û tevgerên civakî yên wê malbata "mêrê kurd" bi "tirkiyeke nazik û rind" xemiliye. Zarokên ku di wê malê de were dinyayê peyvek bi kurdî nizane. Ew ji aliyê neteweyî ve melez e, lê ne melez e, ew tirk e.

Jina kurd dema ku ji xwe re ji tirkan mêr kiriye; ango malbateke ji xwe re ava kiriye; mala wê jina kurd wekî mala tirkekê be, danûstandin, axaftina bi zarokan re û bi giştî liv û tevgerên civakî yên wê malbata "jina kurd" bi "tirkiyeke nazik û xweşik" xemiliye. Zarokê/a ku di wê malê de were dinyayê peyvek bi kurdî nizane. Ew ji aliyê neteweyî ve melez e, lê ne melez e, ew tirk e.

Ev rastiyeke kurdan e.

Ku li rojhilat û başûrê Kurdistanê jî rewş bi vî rengî be mala kurdan xera bû û çû.

Ji vê rewşê re analîzeke civakî divê. Divê ku navek ji vê rewşa kurdan re bê danîn.

Tu navek jê re nayê dîtin.

Ev asîmîlasyon e gelo?

Na xêr ev ji asîmîlasyonê wêdetir e.

Di nava civakê de têgehek heye. Ev têgeh ji bo bûyînên ku di derveyê meşrûiyetê de bin (bi taybetî ji bo zarokên ku di derveyê zewacê de bêne dinyayê) ji wan re "pîç" tê gotin. Mirov dikare li ser vê rewşê û li ser vê têgînê şîrove bike. Ji malbatên ku dê yan jî bav kurd bin, ya jî dê û bav tev kurd bin û zarokên wê malbatê bi kurdî nizanibin ji aliyê ziman vê mirov dikare ji wan zarokan re bibêje "pîçên ziman" bêje.

Peymana zewacê, ango dema ku jin û mêr hev mar dikin bi tenê li ser tiştek li hev nakin, bi tenê li ser mal û milk, li ser xwarin û vexwarina hevpar, li ser bi hev re raketinê peyman çênakin. Ev peymana marê peymana hevjîniyê ye, lihevparîkirina bigiştî jiyanê ye. Di vir de çand jî, ziman jî û tiştên din jî hene. Li gorî wê ku ziman kêm bimîne, yan jî hevpariya ziman çênebe, ji aliyê ziman ve meşrûiyeta wê marê namîne. Zarokên ku di vê dermeşrûiyetê de bêne dinyayê wê demê ji aliyê ziman ve rasterast dibin "zarokên xeyrî meşrû" ango dibin "pîç".

Di vê dema hanê de rûmeta kîjan kurdî radigire ku ji aliyê ziman ve zarokên wan bi vê têgihê bêne binavkirin bînin dinyayê?

*Azad ZAL*

# Ji Weşanên Med 5 pirtûkên Apê Mûsa

## Ji Weşanên Med, bo edebiyata kurdî xizmeteke nû. Weşanên Med, seta ku ji 5 pirtûkên Mûsa Anter (Apê Mûsa) pêk tê çap kir û pêşkêşî xwendevanan kir

**AMED** - Weşanên Med, seta ku ji 5 pirtûkên Apê Mûsa (Mûsa Anter) pêk tê, çap kir û ji xwendevanan re pêşkêş kir. Weşanxaneyê pirtûkên Apê Mûsa yên wekî; "Kimil, Birîna Reş, Ulke û nivîsên Gundemê, Bîranînê min û Vakayîname" ji nû ve amade kirin û weşandin. Beşeke mezin a pirtûka bi navê Bîrina Reş bi kurdî ye. Pirtûkên Apê Mûsa li ser daxwaza zêde ji nû ve ji aliyê Weşanên Med ve hatin çapkirin. Pirtûkên ku ji nû ve hatin çapkirin wiha ne:

**Nivîsên Ulke û Gundemê**

Pirtûka bi navê Nivîsên Ulke û Gundemê ji nû ve hate çapkirin û ji nivîsên Apê Mûsa yên di rojnameyên Ulke û Gundemê de derketin pêk tê. Pirtûk ji nivîsên Apê Mûsa yên di navbera sala 1990 û 1992'yan de di rojnameyên de hatine çapkirin pêk tê û li ser pêvajoyê nirxandin hatine kirin.

**Birîna Reş:** Yekemîn ceribandina Apê Mûsa ye. Di rûpela duyemîn a pirtûkê de wiha tê nivîsandin "Min ev pirtûk di sala 1959'an di hûcreya 38'an de li Harbiyeyê ya Stenbolê nivîsand..." Di piyesa "Birîna Reş" de li ser nexweşiyên Birînên Reş raman hene. Birîna Reş bi tirkî û kurdî hatiye nivîsandin.

**Kimil:** Pirtûka "Kimil" ji nivîsên Apê Mûsa yên di sala 1959'an ên ji ber nivîsa "Kimil" a di Rojnameya "Îlerî Yurtê" de derket û piştî vê nivîs hate darizandin pêk tê.

**Vakayîname:** Di pirtûka "Vakayînameyê " de nivînên Apê Mûsa yên di navbera salên 1987 û 1992'yan ên Nisêbîn, Stîlîlê-Stenbol - Dragosê de pêk tê.

**Hatiralarim:** Di pirtûka "Hatiralarim" de jî bîranîn û serpêhatiyên Apê Mûsa yên girtîgehê û yên di demên cuda de cih digirin. Ji bilî bîranîna gelek nivîsên di rojnameyên cuda de hatine weşandin jî cih digirin.






## Li Hewlêrê pêşangeha Qendîlê vebû

**HEWLÊR** - Li Galeriya Şaneder a li Hewlêrê 2 wênekêşên fransî pêşangehek bi navê "Qendîl: Cîhaneke derveyî zemên" vekirin.

Der barê pêşangehê de Birêveberiya Geleriya Şanederê Hewkar Risken wiha got: "Ev pêşangeh taybet e bi Qendîl û xelkê koçber û aware li dola Şehîdan û wêne ji aliyê her du wênekêşên fransî Lily Stein, Gaspar Tecaro ve hatin kişandin."

Risken der barê pêşangehê wiha axivî: "Me wekî Hewkar grûp karê amadekirina vê pêşangehê bi rêve bir û her wiha Zanîngeha Sorbon a li Fransa û Navenda Rewşenbîriya Fransî li Hewlêrê CCF di pêşangehê de hevkar bûn."

Wênekêş Gaspar Tecaro ji wiha axivî: "Ev pêşangeh karekî dokumantariî ye ji bo pêşandana Qendîlê, ez dixwazim bi rêya vê pêşangehê diyar bikim ku gundên herêma Qendîl di warê jiyanê de çiqas li paş maye û divê em ji bîr nekin ku berê Kurdistan giştik bi vî şêweyî bû, lê niha hatiye guhartin û Qendîl jî di hale xwe de ma ye." Her wiha Tecaro wiha domand, "Xelkê Qendîlê qet hay ji Herêma Kurdistanê nîn e wekî li derveyî zemên bin." Hêjayî gotinê ye ku Hewkar Grûp komeleyeke şêwekarî ye, karê wan ê serekî vekirina pêşangehan bo hunermendan e.

## Li Stenbolê fîlmê 'Edaleta 12'ê Îlonê' hate nîşandan

**STENBOL**- Li Stenbolê di çarçoveya belgefîlmên 12'ê Îlonê de fîlmê "Edaleta 12'ê Îlonê" ya derhêner Cahît Akçam hate nîşandan. Derhênerê fîlmê û bersûcê doza DEV-YOL'ê Akşam, di nîşandana fîlmê xwe de diyar kir ku, darizandina 3-4 kesan têrê nake û got ku lazim e ji bo hesab pirsînê zihniyeta Darbeya 12'ê Îlonê bê darizandin.

Fîlmê derhêner Cahît Akçam a "Edaleta 12'ê Îlonê" di çerçovaya fîlmên 12'ê Îlonê de li Navenda Fîlman a Mîthat Alam a Zanîngeha Bogazîçiyê hate nîşandan. Piştî fîlmê bi beşdariya Hîndekara Zanîngeha Bîlgiya Stenbolê Nivîskar Ferîde Çîçekoglu, Derhêner û bersûcê doza DEV-YOL'ê Cahît Akçam, govtûbêjek hate lidarxistin. Akçam, di gotûbêjê de diyar kir ku darizandina 3-4 kesan têrê nake û got ku lazim e ji zihniyata darbekar hesab bê pirsîn û lazim e êşên hatine kişandan, ragihînin nifşên nû bi vî rengî dîrok û hişê civakê zindî bihêlin.

# SRK: Li Başûr 415 rojname û kovar derdikevin



**SILÊMANÎ** - Sendîkaya Rojnamegerên Kurdistanê (SRK) ragihand ku di dema niha de li Herêma Kurdistanê hejmara rojname û kovarên ku têne weşandin 415 in.

Birêveberê Kargêriya SRK'ê Yûsif Qesab li ser mijarê wiha got: "Ji dema derketina qanûna rojnamegeriyê li Herêma Kurdistanê ji 22'yê îlona 2008'an jimareyeke mezin ji kovar û rojnameyan destûr wergirtine û niha bi şêweyekî rojane, heftane yan jî mehane ew weşana xwe dikin."

Qesab li gorî hejmara wan rojname û kovarên li Herêma Kurdistanê derdikevin wiha axivî:

"Li her çar parêzgehên Herêma Kurdistanê Hewlêr, Silêmanî, Duhok û Kerkûkê 415 rojname û kovarên destûr wergirtine weşanê dikin."

Ji rojname û kovarên li Herêma Kurdistanê beşek jê bi ser partiyên herêmê ve ne û jêdera wan a darayî partî ye, lê beşê din jî serbixwe ne û bi rojnameyên azad tê wesfkirin û ji aliyê darayî ve Hikûmeta Herêma Kurdistanê piştgiriya wan dike.

Kakşar Oremar
kaksharoremar@gmail.com



## Li pey boykotê!

Li ser parastin û buhayê ziman "Alphonse Daudet(1840-1897)" nivîskarê navdarê firansî wiha dibêje: "Ger gel an jî neteweyek rastî şikestinê bê, lê zimanê xwe biparêze wekî wî girtî ye yê ku mifteya deriyê zindana xwe li cem xwe hilanîbe".

Dema ku em li dîroka xwe temaşe bikin, berxwedana hezaran salan tê dîtin ku bav û kalên me ji bo mayîna çand û zimanê me li hemberî neyarên xwe kirin.

Bakurê Kurdistanê di her du qadên siyasî û civakî de ber bi pêşve dimeşe. Îsal boykotkirina dibistanan pêngaveke nû bû ku xwedî wateyeke xwe ya taybetî ye.

Ziman stûna bihêza neteweyî û namûsa me ya çandî-wêjeyî ye. kurdî yanî mayîna me û bê ziman em nikarin bêjin ku di nava malbata gelên cihanê de: "Em jî hene".

Rastiyek heye ku divê her kes bizanîbe: Ger zimanê me bimire, hingî "serxwebîna Kurdistan" an jî "hebûna welatekî azad" jî ji bîr bikin.

Tenê qêrîn û feryad bes nîn in. Êdî divê ev rewş derbasî pêvajoyek din bibe. Divê sazî an jî organek bê çêkirin ku gelek akademîsyenên zimanzan, lêkolînvan, zaniyar û zimanas ji nava me kurdan têde kar û xebatê bikin. Ew dikarin bi nêrîneke zanistî li ser koka peyvan, dewlemendiya zaravan û duristkirina kurdî li ser bingeha diyalêktên heyî pêngavên mezin bavêjin. Wiha ye ku ew dikarin li ser dew- lemendî û standardkirina kurdî bisekinin.

Ji ber wê jî duristkirina "Ferhengistana ziman û wêje ya kurdî" pêwîstiyeke demê û dîrokê ye. Ev kar yê bibe germahiyeke pozîtîf a vê hereketa ku ji bo bi fêrmî naskirina kurdî li bakurê Kurdistanê heye. Ger di vê rewşê de hêzeke piraktîk nebe, tenê avêtina dirûşman têr nake. Em divê ji şaxekê ber bi şaxekî bilinditr bifirin. Ev bizav bi serê xwe şoreşeke ku yê pê re şax û gulên nû ji dara pîr û kevnara kurdî bibişkivin. Dara ku bi sedan salan ketiye ber bivirê tîjê dagirkerên Kurdistanê.

"Ameda peytext" dikare ji van karên wiha buhagiran re bibe navenda destpêkê. Elbet destpêka her karekî zehmet e, lê pê re mîrasdarên kurdî(gelê kurd) yê bêtir şiyar bibin û zêdetir yê bibin dilbendên zimanê xwe yê zikmakî. Ev ferhengistan dikare xwedî çendîn komîteyan be ku her yek ji wan di warekî da xizmeta kurdî bike.

Mesela "komîta dewlemendkirina zarave û diyalêktên kurdî" ku bi serê xwe lêkolîn û xebateke zanistî dixwaze. Demek yê bikişîne ku em encamên vê xebatê bibînin, lê piştî 10-15 salên din kurdî yê bejina xwe rast bike û bibe zimanekî zindî weke gelek zimanên din.

Torinê mîrê Botan Dr. Kamran Bedirxan li ser zimanê me yê şirîn wiha diqêre:"

***Kurmancî ye zimanê bav û kal e***
***Tirba xwe de dê bi wî binale***
***Kurmancî ye deng û şora paşîn***
***Bi Kurmancî tenê bi dengê kurdî***
***Sor û gewr û kesk bi rengê kurdî***
***Banî me dikin ji tariya kûr***
***Bavê min û dadka sipîpor***
***Tirba xwe de dê bi wî binale***
***Kurmancî ye zimanê bav û kal***

Ji roja par-parbûna hêlîna kurdan, dijberên mayîna kurd û Kurdistanê trajêdî li pey hev anîn serê zimanê me. Bi hêzeke mezin ket jêr golebaran peyvên biyanî, lê hebûna xwe parast. kurdî gelek cara hatiye birîndar kirin, hinek mezin û rewşenbîrên me jî xizmeta siyaseta dijmin kirin, lê ev birînên biçûk nekarîn dara hezar şax a kurdî kirmî bikin.

Zimanê me hatiye birîndarkirin, lê neketiye ser çoka, dibe ku li hinek herêmên Kurdistanê bêhêz û nexweş ketibe, lê ji meşê neketiye, birîndar bûye lê neketiye nava ciha. Bi koriya hemû nehezan piştî hezaran salan hê jî li ser piya ye. Eve sirra mayîna me.

Çend sed salan qedereke reş anîn ber deriyê kurdî, lê edebiyata kurdî ya nivîskî û devkî rêyeke wiha neda talankeran ku bi ser bikevin. Geleka xwestin çand û kultura me wenda bibe, lê tîra wan bi kevira ket û "siwar hatin û peya çûn."

Li pey van hemû zehmetiyên ku bav û kalên me ji bo mayîna vê gencîna mezin kişandine, pêwîstiya me gelek bi "Ferhengistana ziman û wêjeya kurdî" heye. Pê re em jî mîna gelê alman dikarin ji dewlemendiya zaravên kurdî "zimanekî istandard" biafirînin. Ev yê bibe xala îspata wê rastiyê ku kurdî namire, belkî yê bibe zimanekî bihêz.

Çimkî kurdî yek ji zimanên berfireh, şirîn, kûr, dewlemend û sade yê di nava malbata zimanên cihanê de ye. Ev sifetên bedew û hêjatî ji hêla bav-kala û mezinên me ve ji me re hatine pêşkêş kirin û ji her tiştekî ferztire ku em vî mîrasê giranbiha weke canê xwe biparêzin.

Hezar astengî li ser rêya meşa dîroka me çêkirin, lê tikesî, çi dîktator û komarên înkarger nekarîn zimanê me di dil û mejiyê me da yasax bikin. Ev encama berxwedana hezaran salan ya kalk û bapîr, dê û dapîrên me ye. Doza Kurdayetiyê û pê re hebûn û mayîna me jî hêvênê xwe ji wê standiye. Ev boykotkirina xwîndingehên li bakurê Kurdistanê yê pel bavêje rojhelat û rojavayê Kurdistanê. Herwiha ev pêngava pîroz û mezin yê bibe sedem ku rayedarên T.C.'ê hinek guherandinan di makeqanûna xwe de pêkbînin.

Pîroz be ev meşa ber bi serfiraziyê ve.

Rupel 12+++++:Layout 1 26.09.2010 13:34 Page 1

Rojeva Welat
27 Îlon 2010 Hejmar: 20 Sal: 1 www.welat.com

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü:
Sevim KAPLAN

Yönetim Yerî:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88

Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

# Remza payîzê û dermanê xwînê Guvîj



Guvîj remz û nîşana payîzê ye. Heke hûn bibînin guvîjan li sûk û dikanan cihê xwe girtiye, bizanibin ku payîz hatiye. Guvîjên ku ji çiya û çolteran dadikevin ser dezgehên etaran ji aliyê gel ve eleqeyê dibînin

**AMED / DÎHA** - Bi hatina payîzê re li çiya û çolteran team û berhemên guvîjê hêdî hêdî cihê xwe li ser dezgehê etaran digire. Dema guvîj ji çiya û çolteran dadikeve ser dezgehê etaran, mizgîniya payîzê jî dide mirovan û mirov li gorî wê amadekariyên xwe yên zivistanî dikin.

Guvîj remz û nîşana payîzê ye. Heke hûn bibînin guvîjan li sûk û dikanan cihê xwe girtiye, bizanibin ku payîz hatiye. Ji ber vê yekê jî êdî hûn hêdî hêdî amadekariya zivistanê bikin û tedbîrên xwe bigirin. Li gorî lêkolînan welatê guvîjê Rojhilata Navîn û Ewropa ye. Dîroka dara guvîjê pir kevn e.Tê zanîn ku Beriya Zayinê wekî derman hatiye bikaranîn.

Teamê guvîjê ji gûzê biçûktir e. Bi şekl û şemalê xwe dişijbe hinarê. Rengê guvîjê zer, sor û pirtûqalî ye. Di teama guvîjê de 1-3 dendik hene. Tehma guvîjê wekî rengê wê xweş û şêrîn e. Dara guvîjê herî zêde qasî 10 metreyan bilind dibe. Zêdetir bejna wê di navbera 2-5 metreyan de tê guhertin. Şaxê darê bi strî ye û kulîlkên pembe, şîrik û sipî lê dikevin. Zêdetir li çoltarên çiyê û warê zinar û lat çêdibin. Tehma guvîjê tirş û şêrîn e. Demsala payîzê bi hatina baranê re li ser hemû dezgeh û tableyên etaran cihê xwe digire. Li Kurdistanê û welatê cîhanê nêzî 100 cûreyên guvîjê tên dîtin. Dara guvîjê zexm e. Dara guvîjê heta 500 - 600 sal emrê wê heye. Ev dar bi bêna kulîlkên xwe yên pir xweş kêzik û mêşan li xwe kom dike û piştî toz li kulîlkan dikeve givîş digihîjin.



**Ji bo dilî baş e**

Guvîj ligel tehma xwe ji tenduristiyê re jî gelekî baş e. Guvîj, ji ber ku ji aliyê madeyê flavonoid (flavon) ve pir dewlemend e, ji dil û demaran re jî gelek baş e. Ji ber hormonên antîoksîdant destûr nade tevgera dilî rastî astengan bê û rê li pêşiya qeyrana dilî digire. Li gorî lêkolînan, ev tehm herikandina xwînê ya ser dil û mejî zêde dike û tevgera dilî dixe bin kontrolê. Her wiha rê li ber tansiyonê jî digire. Destûr nade ku demarên oksîjenê dibin ser dilî bixetimin û dilî diparêze.

**Kulîlkên wê jî derman e**

Kulîlkên guvîjê dema di nava avê de tê kelandin û tê vexwarin, rê li pêşiya rûnê nebaş digire. Kulîlk û pelê guvîjê li dijî hucreyên pençeşêr û tumoran dermanekî gelek baş e. Dîsa li dijî virûsa HIV a dibe sedema nexweşiya AIDS'ê şervaneke pir baş e. Ên ku bixwazin pel û kulîlkên guvîjê wekî derman bi kar bînin, divê di demsala kulîlkan de, kulîlkan kom bikin û baş hişk bikin. Tehm, pel û kulîlkên guvîjê di nava avê de tê kelandin û piştî ku hate parzinandin tê vexwarin. Kesekî nexweşiya wî hebe rojê 3 caran ava pel, kulîlk û teamê guvîjê vexwin tu nexweşiyên wan namîne. Li gorî lêkolînan, guvîj, herikandina xwînê ya ser dil û mejiyî zêde dike û tevgera dilî dixe bin kontrolê. Her wiha rê li ber tansiyonê jî digire. Destûr nade ku demarên oksîjenê dikişînin dilî bên xetimandin û dil diparêze. Guvîj ji aliyê maddeyê bîoflavononîdan ku demaran fireh û rehet dike ve gelek dewlemend e. Ev made herikandina xwîn û oksîjena ser dil zêde dike. Hêzê dide dilî. Ev madeya bîoflavononîdan demaran dijdîne û bi hêz dike. Lê kesên nexweşiya dil û demaran bi wan re hebe, her wiha pirsgirêkên wan ên tansiyanon jî hebe pêwîst e ku sebra wan jî hebe û ne tenê rojekê her wiha qasî 10-15 rojan li ser hev guvîjan bixwe. Ligel sûdê wê yê demar, dil û tansîyonan mirov ji emel jî xelas dike û tansiyon dadixe. Li aliyê din ji bo gurçik û rûvîkan jî gelek fêdeyê guvîjê heye.

**Depoya vîtamîn e**

Vîtamînên ku di nava guvîjê de cih digirin wiha ye: B1 - B2 - B3 - B5 - B6 - B12, Ên ku bixwazin pel û kulîlkên guvîjê wekî derman bi kar bînin, divê di demsala kulîlkan de, kulîlkan kom bikin û baş hişk bikin. Her wiha tehmê guvîjê jî dema ku gihiştin têne komkirin.

Li gorî herêman navê guvîjê wiha ye: Guvîj, gîvij, guhîj an jî gîjok tê gotin. Nasnameya wê ya zanistîwiha ye: Beş; Magnoliophyta, Çîn; Magnoliopsida, Kom; Rosales, Famîle; Rosaceae, Binefamîle; Maloideae, Cins; Crataegus





# Bermahiya 9 hezar salî dîtin

**ÎZMÎR / DÎHA**- Endamê Hîndekariya Beşa Arkeolojî ya Zankoya Edebiyatê ya Zanîngeha Egeyê (EU) Alg. Doç. Dr Zafer Derîn, diyar kir ku di kolanên xwe yên li Girê Yeşîlova de, warê ku aydê 8-9 her sal berê yê ku aydê Dema Kevirên Biriqî bû dîtine. Derîn, anî ziman ku bi vê tespîtê re derdikeve holê ku çanda Îzmîrê ne 5 hezar sal, 8-9 hehzar salî ye.

Ekîba ku ji 15 kesî pêk dihat û her wiha serokatiya wê jî endamê Hîndekariya EU'yê Alg. Doç. Dr Zafer Derîn dikir, 3 mehan xebateka arkeolojiye meşandin. Di encama vê xebatê de nêrîneke nû ji bo dîroka çanda Îzmîrê hate vekirin. Encamên ewil yê ku ji kolana rizgariya Girê Yeşîlova hatin girtin de, derket holê ku niştecîhbûnî digihêje 8-9 hezal salî.

Ji aliyê Zanîngeha Egeyê û Muzeya Arkeolojiyê ya Îzmîrê ve ji 27 tîrmeha sala 2005'an heta niha li taxa Bornova Karacaoglan li Girê Yeşîlova xebat dihatin meşadin. Encamên ewil yên hatin bi destxistin hatin aşkerakirin. Derîn, der barê xebatên xwe de nêrînên xwe anîn ziman û diyar kir ku Îzmîr ne 5 hezar sal berê, 8-9 hezar sal berê şiklê xwe girtiye.

**Di bin aluvyonan de war**

Derîn, di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku Girê Yeşîlova, beşeke wê ya mezin bin aluvyonên ku Çemê Manda aniye de, maye û ji ber vê jî berê nehatiye tespîtkirin. Derîn, wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di encamên me yên ewil de derket holê ku gir nêzî metreyekî di bin aluvyonan de maye. Her wiha di bin vê aluvyonê de warekî Neolotîk yê ku 3-4 metre ne û aydê 8 hezar sal berê ye hate dîtin. Ev yek ji aliyê me ve hate tespîtkirin. Li Girê Yeşîlova war, 4 katê çandê pêk tê. 4 metre di binê erdê heye. Li gorî texmînê me 8-9 hezar sal berê ev war hatiye avakirin. 6 hezar sal berê yanî di dema Kalkolîtîk te ji ber Çemê Manda lehiyên mezin derketine holê û di encama vê de ev war hatiye terk kirin. Piştre van kesan ji vir koç kirine û li Girê Yassi Tepe ku me nû kifşkiriye bi cîh bûne. Yanî 5 hezar sal berê ji ber ku ev war bi aluvyonan tije bûye, veguheriye goristaneke dema tunç." Derîn, dest nîşan kir ku li gorî daneyên ewil li wê herêmê ligel mîdye û salyangozê, neçîra beraz, xezal û gelek sewalên din dihate kirin û nivî vê gelê baweriya wan hebûn. Derîn, destnîşan kir ku Girê Yeşîlova xwediyê çemê mezin, çavkaniyên avê yen dewlemend û xwezayeke baş bûn û wiha lê zêde kir: "Wê demê behr zêdetir di hundir de bûn û mirovan ji gelek ji behrê hez dikir. Ji kevirên çakmak, dikirin amûrên birînê. Her wiha ji amûrên wan tên fêm kirin ku xwarinên xwe dipirjirandin û di van amûrên ku bi axê hatine çêkirin de, veşir didan. Her wiha di kolanan de derket holê ku wê demê jinan ji mîdye û keviran kolye çêkirine û mêran jî ji keviran amûrên wekî tîr û kevan çêkirine. Her wiha tê fêm kirin ku kesên vê demê baweriya xwe bi Xwedevend Kibeleya tînin."

**'Barkirin Kadîfekaleyê**

Derîn, di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Li gorî hemû xebatên ku me heta niha meşandiye de derket holê ku ev der cihê ewil yê war ê Îzmîrê ye. Dora vî warê hemû bi çiya û giran dorpêçe. Ev deşt jî di navbera wan de derketiye holê. Di encama kolanan derket holê ku çanda Îzmîrê ne 5 hezar sal, 8-9 hezar sal in. Di demên cuda de jî gel li gorî pêwîstiyên xwe koçî Smyrna û Kadîfekaleyê kirine."



# Sûlava Fîsqeya dê dîsa bike xumexum

**AMED** - Di navbera şaredariya bajarê mezin a Amedê û Ajansa Pêşveçûna Karacadagê de peymanek ji bo Sulava Fîsqeya dîsa wekî berê biherike hate çêkirin.

Serokatiya daîreya stratejîk a şaredariyê pêngava ji bo, “Sûlav, Fîsqeya, Kafe û Goletê” avêt. Di navbera sekreterê giştî yê ajansê de û li ser navê navê şaredariyê jî şaredar Osman Baydemîr peymanek çêkir. Piştgiriya projeyê ji sedî 30 ajans û ji sedî 5 jî Odeya Bazirganiyê ya Amedê dike ew ê di 18 mehan de biqede. Bi projeyê Sûlava Fîsqeya ew ê wekî berê bi xûmexûm biherike û qadên pîknîk û seyranê wê ji bo gel li dorê were çêkirin.

# Qamirgeha Nehîlê tune dibe

**COLEMÊRG** - Qamirgeha Nehîlê ya li Gevera Colemêrgê ye û heta sala 1985'an de di nava penavên (plato) herî navdar yên cîhanê de cih digirt niha bi tunebûnê re rû bi rû ye. Konseya Bajar a Geverê ji bo qamirgehê banga hestiyariyê kir û got ku di warê xwedî lê derketinê de gelek qels mane.

Ev xwezaya ku bi heybeta xwe bal dikişand ser xwe niha winda dibe. Li ser vê yekê Konseya Bajar a Geverê li qamirgehê daxuyaniyek dan û banga hestiyariyê kirin. Daxuyaniya ku îmzeya saymanê Navenda Giştî yê BDP'ê Salîh Yildiz, şaredariya Geverê, Esenderiyê, Komeleya Şêwirmendî û Çandê ya Geverê, Odeya Bazirganî û Saniyiyê, Odeya Ajokar û Wesayîtan, Yekitiya Xwedikirina Sewalan, Odeya Esnaf û Sanatkaran, Platforma Şaxên KESK'ê, Kurdî-Der, Komeleya Cîlo Dagi, Odeya Zîraatê ya Geverê, Medyaya Herêmê ya Geverê, Yuksekova Guncel Haber û Komeleya Astengdaran, lê hebû ji aliyê Serokê Konseya Bajar Muhyettîn Unal ve hate xwendin. Unal di daxuyaniyê de anî ziman ku ev qamirgeh û deşt li gorî lîteraturên zanyarî di 2 mîlyon salî de ava bûne û west ku bila qetlîama xwezayê bi dawî bibe. Unal da zanîn ku niha qamirgeh bûye qada çopê û xwest ji bo ku qamirgeh bê xilaskirin bilah her bi hestiyarî tevbigere.



www.arsivakurdi.org